



Danerê Rojnameya pêşî a Kurdi
Miqdad Mûhed Bedirxan

Armanc

Rojnameya Mehane

Hejmar, No: 136
Sibat
February 1993
Buha - Price
15 SKR, 3DM

Sempozyuma Însiyatîfa Ronakbîrên Kurd çêbû
**Em bi hev re bijîn,
lê ne bi darê zorê**



Sempozyum bi axafina Şerafettin Elçî vebû

Prof. Server Tanilli:
"Naskirina realîta Kurd; naskirina coxrafya, tarîx û zimanê Kurda ye, naskirina kultur û mafêñ demokratik û netewî û mafêñ siyasi ên Kurda ye"

Prof. Mete Tuncay: "Pirs di nav federasyonê de dikane hel bibe".

Dûmahîk r. 11

Bav û keç bi panzerê ve kişandin û kuştin

Dewletê, gundê Dêrikê, Xirar hilweşand. Hemû gundi li meydanekê civandin, li ber çavê wan 3 kes gullebaran kirin. Bav û keçek bi panzerê ve girêdan û li dûv panzerê kişandin.



Dîmenek ji Gundê Xirar ku ji alî hêzên dewletê ve hat xera kirin. (Foto: Armanc)

Roja 24'ê Sibatê li der û dora gundê Dêrikê, Xirarê (Dumanli) ser di navbera gerîlayen PKK'ê û leşkerên dewletê de derket. Pişti ser hêzên PKK'ê never berdan, hêzên dewletê ji wek gurên har êrîşî gund kirin. Xaniyên gundiyan xera kirin. Gundî bi lêdanê li meydana gund civandin. Bi hovîti êrîşî malbata Çevîren kirin, li ber çavê gundiyan Ahmet û Yûsuf Çevîren kuştin. Leşkeran ji azayê

yekevîn yê muxtar, Necdet Ariza pîrsin: Divê tu nîşanî me bidî stargeh li mala kê heye?". Li ser bersîva "li gundê me tu stargeh tunene", leşkeran Necdet Ariz gulebaran kirin.

Pişti wê ji leşker û milfsan, ji meydana gund Seydo Çevîrenê 60 salî û keça wî ya 18 salî Abide bi xwe re derxistin derveyî gund.

Dûmahîk r. 11

Li Sûriyê welatparêzêndi Kurd di girtîxanan de


□ Dewleta Sûriyê li ser belavoka 3 hêzên Kurd ku 4 meh berê belav kiribûn, li herêma Kurdistanê gelek welatparêzêndi Kurd girtin, avêt ser malan. Hê jî hin Kurd di girtîgehan de ne.

□ Li Kurdistanâ Sûriyê careke din siyaseta Erebkirinê dest pê dike?

Dewleta Sûriyê li ser belavoka ku serokatiya hevpar ya Partiya Hevgirtina Gelê Kurd li Sûriyê, Partiya Pale ya Demokratik a Kurd li Sûriyê û Partiya Demokrat a Yekbûyi ya Kurd li Sûriyê, ku di 5'ê Çiriya Pêşin de belav kiribû, li Kurdistanê dest bi teroreke nedîti kir, li Hesiçê, Qamîşloyê, Dirbêsiyê, Serê Kaniyê, Dêrikê û li gelek gund û deverên din avêt ser malan, gelek welatparêz girtin. Muxaberatê Sûriyê daketin kuçe û cehdeyan û belavokên daleqandî, qetandin.

Serokatiya her sê hêzên Kurdistanâ Sûriyê ev belavok bi munasebeta salvegera 30 saliya jimartina şovenî ku di 5'ê Çiriya Pêşin ya sala 1962'an de pêk hatibû û li dor 150 hezar Kurd ji hevwelatiya Sûriyê hatibûn derxistin, belav kiribûn. Di belavokê de tê gotin ku iro hejmara van kesan gelek zêde bûne. Zarak û neviyên kesen ku ne hevwelati ne di nifûsê de

Dûmahîk: r.11



Di Meclisa Sûriyê de li ser rewşa
Kurdên bê nifûs munaqşe

rûpel: 2

Banga Hevgirtin-PDK, Kawa, PSK û YEKBÛN ji raya giştî ya Kurdistanê re

"Em mecbûr in ku vê felaketê bidin sekinandin"

"Yan emê hêzên xwe bikin yek û dijminê xwe ruswa bikin, yan jî emê lekeyek binketinê ya nû li eniya xwe xin. Em wextê wenda nekin, riya sisîyan tuneye. Ji bo ku yekitiyên herêmî bibin yekitiyên netewî, berpirsi ya her kesî ye.

Berxwedana gelê ku hêza xwe kiriye yek ji aliyê tu zalimî ve nikare bê şikandin. Ku em bi vê zanebûnê kar nekin, si-bê dikare pir dereng be".

Di meha Sibatê li Diyarbekirê Hevgirtin-Partiya Demokrat a Kurdistanê (Hevgirtin-PDK), Partiya Sosyalist a Kurdistanê (PSK), KAWA û Partiya Yekbûyi ya Gelê Kurdistanê (YEKBÛN) li ser rewşa Kurdistanê beyanek bi hev re derxistin.

Di beyanê de bi giştî li ser rewşa Kurdistanê tê rawestan. Qala bûyerên dîrokî ku iro li Kurdistanê her roj diqewimin, tê kirin

Belavok qala siyaseta kolonyalist ku Tirkîyê iro wê bi hemû hovîti û barbariyê dimeşîne, dike. Û dibêje, ev siyaset iro li hemû

Dûmahîk r. 11



H. Derwêş:

"Pêwîst e ku heqê hevwelatiyê li kesên bê nifûs bê vegeandin"

Di Meha Çileya Pêşin de li ser programa ku hukûmeta Sûriyê pêşkeşî meclisê kiribû, muñaqeşe çebûn. Di van muñaqeşan de 3 parlamenteñen Kurd û parlamenteñekî Asûrî yên wilayeta Hesiça behsa rewşa Kurden ku ji sala 1962'yan û vir de ji heqê hevwelatiyê Sûriyê bêpar hatine hîştin ranewestin. Bê şik ev kes perçek ji vê civakê ne û halê wan ê xerab ku tê de dijîn, tesirê li ser rewşa yekîtiya mili dike. Li gor erka welatperweriyê û wekheviya hevwelatiyan pêwîst e ku heqê hevwelatiyê li van kesan bê vegeandin.

Piştî van dîtinê xwe, dixwazim hînek ji li ser rewşa wîlayeta Hesiça bisekinim. Ev wîlayet, bi parek baş besdariyê di aboriya wîlêt de dike. Ji % 51'ê zad (dexl), % 54'ê pembo û nîvê petrolê ji vê wîlayetê tê. Lî ev wîlayet heta nuha di rewşek xerab de ye. Ev dever devereke zîretî ye û bi hezaran bîrîn artezyenê lê hene, lê belê riyên zîretî û yên di navbera bajarû gundan de kêm in û xerabene, 600 gundan bê elektirik hene, li bajarû gundan ava vexwarinê ya paqîj, kêm e, xizmeten di warênduristî, kultûrî û hwd. kêm in. Bi kurtî rewşa wîlayeta Hesiça ji hemû wîlayetê din cuda ye û bala mesûlan li ser kêm e. Ez pêşniyar dikim ku komîteyek taybetî bê damezrandin û wezîfa wê lêkolîn û pêşniyarê li ser rewşa vê deverê be."

Parlamenteñerê Partiya Demokrat a Pêşverû ya Kurd li Sûriyê; Hemîdê Hecî Derwêş di gotara xwe de weha got: "Pêşketin bi şiar û daxwazan nabe, pêwîst e jê re kar bê kirin. Em hêvî dîkin ku tişten di programê de hatine gotin, bêñ kirin. Ez li vir dixwazim li ser kêmasyen programê hin tişa bibêjim. Li gor dîtina min hazîrbûna Wezîre Dervekari birêz Farûq El Şerîh di civîna sê qolî ku li Enquerê, di navbera Tirkîyê, İranê û Sûriyê de çebû , ne pêwîst bû. Çimkî Tirkîyê, ku xwediya gazîyê bû, xwest ji xwe û İranê re şîrîken Ereb peyda bike ku rehettir bikaribin destdirêjiya nav karê İraqî bikin û ji aliye din xwestin ku Sûriyê ji bikin şîrîka xwe û bi hev re zorê li gelê Kurd bikin. Di herdû rewşan de ji ev tiş ne di berjewendîya Sûriyê de ye."

H. Derwêş di derheqê azadî û mafê damezrandina partî û weşana rojnaman û guherandina qanûna hilbijartina de ji weha got: "Pêwîst e azadiyê demokratik bêne firehkirin û azadiya peyvû fikri bête xurtkirin. Ev ji bi serbestkîrina kar û barêñ siyasi û damezrandina partian û vekirina imkânîn weşana rojnaman (ci yên partiyen ku di cephe de ne û ci ji yên serbixwe) ve girêdayî ye. Ji aliye din divê qanûna hilbijartina meclisê û ya idareyê meheli bêñ guhartîn, meclis bibe xwediya selahiyetîn herî mezin li welat û selahiyetîn idareyê meheli bêne fi-rehirkirin. Pêwîst e hemû girtiyan siyasi yên ku di hepsan de ne bêñ berdan û idara urfi bê rakirin."

H. Derwêş di derheqê rewşa Kurden bê nifûs û rewşa wîlayeta Hesiça (Cizîrê) de ji weha got: "Di mesela yekîtiya mili de, li gor gotina "Welat milkê hemûyan e", nabe ku em rewşa 150 hezar hevwelatiyê Kurden ku di sala 1962'yan de li wîlayeta Hesekê ji

heqê hemwelatiya Sûriyê bêpar hatine hîştin ranewestin. Bê şik ev kes perçek ji vê civakê ne û halê wan ê xerab ku tê de dijîn, tesirê li ser rewşa yekîtiya mili dike. Li gor erka welatperweriyê û wekheviya hevwelatiyan pêwîst e ku heqê hevwelatiyê li van kesan bê vegeandin.

Parlamenteñerê Kurde Füad Eliko ji di gotara xwe de weha got: "Divê idara urfi bê rakirin û heqê hevwelatiyê li zaroyen gelê Kurd bê vegeandin. Em dizanin ku gelê Kurd li Sûriyê ev bi sedan sal in qedera xwe bi qedera birayê xwe yê Ereb li Sûriyê ve girêdaye, insanen Ereb wek cîran, wek dost û heval dîtin; bi hev re çûne şer, nobet girtine û şehîd bûne. Ma we li dor wî tiştek ne bas dîtiye ku ew bi cezayek mezin ku mînaka wê kêm caran li dinê tê dîtin, ceza kiriye. Ez bangî Serokê Meclisê û hukûmetê dikim ku li ser vê meselê bisekinin û heqê hevwelatiyê bidin van kesan ku jîxwe berê hevwelatiyê Sûriyê bûn."

Her weha parlamenteñerê Asûrî, Beşîr İshaq Sadî ji di gotara xwe de daxwaz kir ku qanûna damezrandina partian û weşandina rojnaman derkeve û idara urfi bê rakirin. Wî di gotara xwe de behsa Kurden bê nifûs kir û weha got: "Ez li vir daxwaza bi deh hezaran birayen me yên Kurd ku di sala 1962'yan de li wîlayeta Hesiça ji heqê hevwelatiyê bêpar hatine hîştin, tînim ziman. Pêwîst e ev heq li wan bê vegeandin."

Kesên ne hevwelatî "ecnebi" ji van mafan bêpar in

- 1- Nikarin xaniya ava bikin, xani û milk li ser navê xwe tapû bikin.
- 2- Nikarin mehra resmi bibirin.
- 3- Eskerîyê nakîn.
- 4- Nikarin di université de bixwinin.
- 5- Nikarin di karêñ resmi de wek memûr û karker bixebeitin.
- 6- Wek hevwelatiya, kûponen wan ên erzaqê tunene. (bi van kûponan meriv erzaqê, wek şekir, bîrîncî, rûn û çayê bi erzani dikire).
- 7- Heta kaxizek ji emnî. ji beşê otelan neynin, nikarin li otelan razen.
- 8- Nikarin pasaport bigrin û derkevin derveyi Sûriyê.
- 9- Heqê wan û dengdanê tune ye.
- 10-Di ciyê nufuse de kaxizek sor bi navê "ixrac qeyd" didin wan û tê de nivisiye ku ev kes di hejmarta sala 1962'yan de nehatiye nivisin.

Li derveyi van "mektûm" ji hene ku tenê dikarin belgeyek ji muxtar bigrin, rewşa wan hîn xerabtir e.

Li gor hejmarta sala 1983'an li Amûdê ku nufusa wê 21 hezar e, 8 hezar "ecnebi" hene.

HEP fonksiyona xwe bi cî tîne ya na?

Lewend Firat

Du mebûsên HEP'ê; mebûsê Sirnexê Mahmûd Alinak û yê Mûşê Muzafer Demir di 18'ê Sıbatê de ji HEP'ê (Partiya Ked a Gel) istifa kirin. Herdu mebûs sebebî istifa xwe wiha diyar kîrin: "Wezîfîn ku di meclisê de ketin ser milê me, me neanî cih, bi insanan îşkence kîrin, demokrasî û peymanen navnetewî hatin îhlâlkirin. Em li hember van kînan bê deng man. Halbûkî me karibû xelkê seferber bikira ji bo mafê wan. Lî me ev nekir. Ji ber ku di merkeza HEP'ê de hin berpirsiyâr hene ku baweriya wan bi quweta xelkê ya pêximker(caydırıcı) nedihat û bi vî hawî ferqa HEP'ê ji partiyen din yên duzenê nema."

Dibe ku sebebîn istifakirina van herdu mebûsan ji bo HEP'ê ne ciddi be, lê wexta meriv bi tevayî siyaseta HEP'ê û çalakiyên wê yên di hundîrê parlamentoye dinere, hînek rastî di beyana M. Alinak û M. Demir de hene. Meriv nikare bêje imkanen di parlamentoye de ku ketin destê wê, bi kar anîn. HEP'ê bi 18 mebûsên xwe ve qasî Ecevit li meclisê deng neda.

Hîn di destpêka vekirina Meclisê û dema sündxwarinê de eşkere bû ku ew mebûsên HEP'ê ne di wê kapasiteyê de û ne ji baweriya wan bi xwe heye ku ew doza ku xistibûn ser milê xwe, bi cî bînin û bi rastî bibin berdevkîn gelê xwe yê mezlûm di meclisa Anqerê de.

Ku meriv çend daxwaznamen Mahmûd Alinak ku di raya gişti ya Tirkîyê û Kurdistanê de bal kişand ser xwe nejmîre(daxwaznamâma di derheqê Kontr-gerilla de, daxwaznamâma di derheqê meclisa herêmî de û hwd.) parlamenteñerê HEP'ê ne wek partî, ne ji wek şexs di civînen meclisê de li ser pirs û pirsegirêkîn girîng daxwaznameyek pêşkeşî Meclisê nekîrin û fonksiyona xwe ya Meclisê bi kar neanîn. HEP'ê li derveyî Meclisê ji siyastek aktiv najot, tiştekî berbiçav nekir. Wê tu siyaset neafirand, bi mîjî û bi çavén PKK'ê li bûyaran mîze kir. Halbûkî karibû ji bo azadiya siyasi, di radyo û televizyonê de ji bo serbestkîrina zimanê Kurdi û ji bo mafê Kurden yê huquqi qampanya vekira, meş û mitîng çekira, imze berev bikira û hwd. Çawa ku hemû partiyen "rast", sosyaldemokrat û "dînî" yên Tirkîyê ji bo piştgiriya Misilmanen Bosna-Hersekê qiyamet rakirin, HEP'ê ji karibû piştgiriya birayen xwe yên Başûr bikira, lê şûna ku vê bike, parlamento û devleta wan ya Federe biparêze, li dijî plan û dekû-dolabêñ dewletêñ meetingehkar bisekine, ew rabûn li dijî wan derketin bi beyan û helwesten xwe ew bi "hevkariya" emperyalizmê suçdar kîrin. Li dijî cinayetên qesasnediyar, li dijî kontr-gerila, li dijî valakirina gundan û hwd. karibû dengê xwe bilind bike, gavê konkret bavêje.

Ew Hatib Dicle û Layla Zanaya ku di vekirina Meclisê, di

dema sündxwarinê de qiyamet ra kîrin û dawiyê ji gotinê xwe paş de stendin ci heyf ku piştî wê qet derneketin kursiya Meclisê. Li gor rojnama "Hurriyet"ê piştî sal û nîvîkî Hatîb rojya xwe xwar û li dervayê rojava meclisê destûr ji serokê meclisê xwest ku axatinekî bike. Mebûs hemû ketine meraqê ka dîsa wê Hatîb Dicle ci bi bêjê? Hatîb rabûye li ser pirs û pirsegirêkîn dergevanan(kapıcıyan) sekiniye û heq û huquqî wan parastiye. Meriv ne li dijî dergevan û menfeetên wan e, lê bûyeren wiha girîng li Kurdistanê diqewimin û bi rojan rojeva Tirkîyê meşxûl dikin, Hatîb rojeke ew neanine Meclisê.

Partiya HEP'ê ne tenê di meclisê de, herwisa di kongreyen xwe de ji dûr û dirêj li ser pirsâ Kurdan nesezinî, tehamulê dîtinê cûda nekir, muñaqeşe venekir, encama kongren xwe, wek beyan ji raya gişî re eşkere nekir. Ya herî xerab wexta serokkomarê Tirkîyê Turgut Ozal digot; "lazım e meriv mesela federasyonê ji li Tirkîyê muñaqeşe bike" kongra HEP'ê ciyiya û ew li ser vê meselê qet nesezinî. Politika neafirand, tenê temaşa bûyaran kir. Kongren HEP'ê tenê bûn kongreyen guherandina serokê wê. Di sê salan de sê serok guherandina. Kongreya Duyem a istisnayî ku par di meha İlönê de çebû ji 504 nûneran, A. Turk tenê bi dengen 94 nûneran hat hilbijartîn û bû serok. Ev ji rewşa HEP'ê diyar dike. İro ji programke HEP'ê bi rûkûpêk li ser mesele Kurd tuneye û dîtinê wê di vî warî de ne zelal in.

Ew wek partî li ser şopa PKK'ê meşîya. HEP'ê şexsiyeta xwe, nasnâma xwe di şexsiyeta PKK'ê de dît, serokê xwe ji Abdullah Ocalan qebûl kir. Ev tiş di kongreyen xwe de ji tesdiq kir, şûna bije "bijî Feridûn Yazar", yan ji "bijî Ahmet Turk" sloganen "bijî serok Apo" avetiñ. Bi vî hawî bûn sebeb ku dewlet û xelk wan wek partîyeke paravan qebûl bike û mahkeme di derheqê wan de davâ veke.

Yanî HEP bi tevayî ne bû partiya legal a gelê Kurd û ne ji wek M. Alinak dibêje ku bû partiyeke wek partiyen din yên sistemê. Wê xwe wek dengê PKK'ê yê Meclisa Tirkîyê nişan da û bi vî hawî ji ne mumkûn bû tiştekî bike. Ew negîhiştin wê yekê ku ji derveyî rê û metodên têkoşîna PKK'ê, metod û riyê din hene ku pirsâ Kurd di warî çareserkirinê de mesefê bistîne. Ji aliye din, tişte enteresant ew e ku him Kurd, him gelê Tirk û him ji dewlet, HEP'ê wek partîyeke Kurd dibîne. Lî HEP vî navî li xwe nake û dibêje ez ne tenê partiya Kurd im, herwisa partiya zahmetkêş Tirk me ji. Lî bi objektifî HEP partiya Kurdan e. Ji ber ku him objektif him ji kesen ku berpirsiyareñ HEP'ê ne Kurd in û kesekiye Tirk di nav HEP'ê de cî negirtiye.

Ev fîrsenda tarîxî ku di Meclisê de ket destê HEP'ê, wê jê feyde nekir. Ditirsim aqûbeta wê wek ya TIP'ê(Partiya Karkeri Tirkîyê) be û ev imkanen tarîxî carek din nekeve destê wê.

Armanc
Rojnama Kurdi ya mehane
Monthly Kurdish Magazine
Redaksiyon:
M. Eli
Zinare Xamo
Hesen Mizgin
Mirza Bextiyar
Lewend Firat
S. Rêving
M. Lewendi
Redaktore berpirsiyar:
M. Eli
Berpirsiyare beşê
Dimilki: Malmışanji

Adres :
Box: 152 16
161 15 Bromma
Sweden
Telefon
46-8-803135
Telefax:
46-8-801825
Utgæs av:
Kurdiska
Demokratiska
Arbetarunionen
Postgiro: 50 37 99-9
ISSN: 0348 7385

Abonebi
Prenumeration
Abonebiya Salekê
Li Skandinavya
200 SKR
Maqam
Myndigheter
400 SKR
Li Ewrûpa
50 DM
Li derveyî Ewrûpa
40 \$
Anons/ilan
nîv rûpel/ en halvsidan
2500 SKR

Kongra 13'êm a Federasyonê

□ Kongrê di destûrê de guherinên mezin çêkirin; kongra Federasyonê wê du sala carekê biceve. Di navbera du kongreyan de wê konferansek bê çêkirin.

□ Endamên Komîteya Karger ya Yekîtiya Ciwanên Kurd û ya Yekîtiya Jinên Kurd wek nûnerên eslî yên Kongra Federasyonê hatin qebûlkirin.

Roja 27 û 28'ê Sibatê Kongra 13'an a Fedrasyona Komelên Kurdistanê li Swêdê civiya. Di kongrê de ji 42 komelên endam û ji Yekîtiya Jinên Kurd û Yekîtiya Ciwanên Kurd 144 nûner besdar bûn. Kongre bi xwendina marşâ netewî vebû. Di kongrê de nûnerên Hukûmeta Kurd, hêzên siyasi yên Swêdî û Kurdi, rojname, komel, rôxistin û dezgâyên Kurdi û Swêdî besdar bûn. Pişti axaftina serokê Federasyonê Vîldan Tanrikulu, ya vekirinê endamê parlamentooyê cûcigirê serokê Komîsyona Karûbarê Derve yê Parlamentoya Kurdistana Federe, Salar Ismail peyivî. Pişti wî ji berpirsê buroya Swêdî ya hukûmeta Kurdistanê, Taha Berwari maşa peyvê stand. Her du ji li ser giringiya Federasyonê rawestiyen û pişgiriya Federasyonê ya bi hukûmeta Kurdistanê re pesinandin. Ji Partiya Sosyaldemokrat, endamê Komîta Karger, Bjorn Andersson, ji Partiya Muhafezekar, parlamente Gustav Von Essen, ji Partiya Cep û Komîta ji bo Parastina Mafêni Mirovi yên Gelê Kurd, parlamente Berith Eriksson, nûnerê ABF'ê (Yekîtiya Hîndekariyê ya Karkevan) Berth Carlborg, ji Konfederasyona Karkeran (LO) - sendikaya heri mezin e li Swêdê, Kenneth Ahs, ji Organî Hevkariya Federasyonê Biyaniya (SIOS), Pedro Losado, ji Federasyona Tirkîan Erol Aydin, ji Komîta Aşîti ya Swêde Yusuf Kupeli û ji Komela Aşîti û Navbençiyê Eva Zillen wek mîvan peyivîn.

Pişti qebûlkirina rojevê, hilbi-

jartina dîwanê û komîsyonên destûr û bîryaran, rapora xebatê û ya malî hatin xwendin. Munaqese li ser raporat çêbûn û Komîta Giştî û ya Karger ji berpirsiyê hatin azadikirin.

Di vê kongrê de di destûrê de guhertinên mezin hatin çêkirin. Ji kongra 1986'an û vir de ku struktura Federasyonê hatibû guhertin di destûrê de guherinên heri mezin di vê kongrê de çêbûn.

Kongra Federasyonê édi wê du salan carekê di meha Gulanê de biceve. Di navbera du kongreyan de wê konferansek biceve.

Komîta karger ya Yekîtiya Jinan û ya Ciwanan bûn nûnerên tabiî yên kongra Federasyonê. Serokên her du yekîtiyan wê bibin endamên Komîta Karger ya Federasyonê. Li gor vê destûra nuh hejmara endamên komîta karger ji 7 kesan derket 9 kesan.

Di kongrê de gelek pêşniyar û daxwaz hatin kirin û 13 bîryar hatin stendin. Kongra 13'an a Federasyonê bi tevahiya rayan piştgiriya xwe ji bo Kurdistana Federe diyar kir. Herwisa planêner xerakirina Kurdistana Federe û di vê manê de civînên sê qolî yên li Anqerê û li Şamî çêbûn mahkûm kir û bîryar da ku bi nameyekê bala Yekîtiya Netewan û rôxistinêna alaqedar yên navnetewî bikşine ser planêner qirêj yên dijmînen Kurdan.

Di dawîya kongrê de ji bo du salan organên nuh yên Federasyonê hatin hilbijartîn. Di hilbijartînê de serokê berê Vîldan Tanrikulu bi 120 rayan, sekreterê berê Ahmet Karamus bi 107 rayan, rayen heri pir girtin û careke din

ji bo Komîta karger hatin hilbijartîn. Endamên din yên hatine hilbijartîn ev in: Cemal Batûn, Mustafa Aydogan, Sidqi Hirûri, Eziz Ahmedî û Şermîn Bozarslan.

Komîta Giştî: Fîrad Nemrûd, Hesen Mizgin, Batal Betê, Selim Baban, Mencê Aldûr, Salih Caf, Hemîd Gewherî, Mahmûd Kîper, Fewzî Hirûri, Bâvê Tara, Salih Demîr û Çalak Wesi.

Komîta Çavdîr: Mumtaz Aydin, Tarik Yildizhan û Şaxawan

Me ji serokê berê û Vîldan Tanrikulu pîrsî ku ew encamên kongira 13'an cawa dibîne? Vîldan Tanrikulu got: "Kongreya 13'an ya FFKS, bi munaqesejîn avakar û bi bîryarê xwe ve yekîtiya xebata rôxistinî ya civata Kurd li Swêdî û perspektifîn xebata wê hîn zelaltîr kir. Bi guherandinê ku di destûrê de hatin kirin, him besdariyê aliyeñ cûda yên civata me xurttir bûn, him ji imkanîn xebatîn bi plan û xurtkirina pêwendiyê rôxistinî ya navxwe zêdetir kir.

Her wisa bi wan bîryarê ku di kongreyê de li ser naveroka xebatê hatin girtin, perspektifîa yekîtiya neteweyî zelaltîr bû. Ji bo her aliyeñ Kurdistanê him di warê lêxwediderketinê û parastina deskeftan, hem ji li dij rawestana zordestiyê dagirkeran, kongreya FKKS bi bîryarê xwe ve yekîtiya irada xwe diyar kir.

Ev her du aliyeñ bîryarê kongreya 13'an ya FKKS, ji bo civata Kurd li Swêdî serketinek e".

NEYLIK

Nexweşîya payetiye ji nezaniyê tê

Bavê Nazê

Tê zanîn, di nav hemû milletan cihanê de formeke axaftina bi hev re heye. Bo kesen ji xwe mestir, yan bo kesen resmi bi haletê pirejmar 'hûn' tê gazi kirin. Lê ji şûna ku Kurden me bibêjin 'hûn', dibêjin 'em'. Bi gotineke din, ew xwe mezin dikin, kesen li hemberî xwe bicûk dikin. Gelo ev ji ci tê? Diyar e ji ber rûniştina axatiyê di civaka Kurdi de ye. Helbet tê famkirin ku çîma axayê me di heyamê xwe de bi payeti ligel peyayê xwe dipeyivîn û bi pozbilindî li wan dinêrin. Lê gelo çîma niha nivîskar û helbestvanen me bi vê nexweşîye dikevin? Wê bê fam kirin heger em bibêjin ji nezaniyê ye... Édi pîrsa di cihê xwe de li pey tê: Nivîskar û nezanî?

Heger ne nezanî be, wê mirov cawa bikaribe van peyvîn nivîskarîne me rave bike:

"Ez ê bîngehê kurteçiroka Kurdi deynim." Yan ji "Zimanî literaturî yê Kurdi bi berhemên min dest pê dike..."

Di heyamê xwe de Ferat Cewherî bi gotinên li jor di hevpeyvîna xwe di Kurdistan Pressê de bi vî awayî pesnê xwe dabû. Gelo nivîskarî ku bi rastî ji ev rol di çanda mîletê xwe de lîstibe, wê bikaribe weha bêşerm pesnê xwe bide? Gelo ev pîrs ji Çexov bikirana û bigotana "Tu li ser rola xwe ya di kurteçirokê de ci dibêji?", ji şûna bersivê ewê ji şerma sorğulî nebiba?

Romannîvîsê me Mehmet Uzun ji ne dûrî vê bapêşê ye. Ew ji bi munasebet, yan bêmunasebet xwe dike bavê romana Kurdi ya modern. Dîna xwe bidin gotinên "romana Kurdi" û bi ser halan de ji ya "modern". Mîleten ku cîranen me ne; wek Ereb, Faris, Tirk, tevî ku bi sedan roman bi zimanen wan hene, heya niha nikarin bibêjin ku romanen wan yên taybeti hene... Lê Memet Uzun bi "romanek" bi nav roman, xwe dike damezrênerê vi rengê literaturê.

Nexweşîya "damezrêner" ên çîrok û romana Kurdi ji mîjive nas e. Lê herçî zimannasen me, ew heya demekî dûrî vê nexweşîye mabûn. Lê belê di hejmara 132 ya Armancê de zimannasekî me ji xuya kir ku bi vê nexweşîye ketiye. Ew ji mamoste Deham Ebdulfetah e. Ji kerema xwe re baleta xwe bidin bersiva wî ya li ser pîrsa kar û xebata wî; "Karê min ew e ku ez devokên Kurmancî bikim yek..." Werin vê talanê! Mirrovet bêtirs dibêje ku karê min yekîtiya devokên Kurmancî ye. Gelo wê mamoste Deham ci bigota eger yekî bigota: Ez ê kaniyê Kurdistanê hemûya bikim yek.? Bi ya min, bi kêmânî gerek ew di bin simelan re bikeriya û jê berpirsiya: "Sebeb? Ma pêwîstiya me bi vî tiştî heye?" Mamoste, ez ji te dipirsim: Ma pêwîstiya me bi yekîtiya devokên Kurmancî heye? Ji bilî vê tu wê cawa bikarîbî yekî Kurdaxî bi Amûdî bidî peyivandin? Mamoste, heyran, serê xwe neêşîne û dest ji wi karî berde; hem wê ji bo rehetiya te baş be û hem ji wê ji bo zimanê me kêmziyan be...

Hîn berî mamoste Deham mamostekî din di warê ziman de nivîsandibû: "Bixwe ev bûne çend sal ku ez li ser zimanê Kurdi dixebeitim... Û ez gihiştîm wê baweriyê ku tipa 'A' di zimanê me de roleke girîng dilîze..." Gelo di zimanekî de tipen girîng û yên ne girîng hene? Gelo tipen weha hene? Kî pê dizane, dibe ku mamostê me ji mîjive ye lêkolînê girîng û ne girîng li ser tipen girîng û ne girîng nivîsîne û bi vê yekî ne dûr e ku elîfbîya me çend tipan kêm bibe... Bi rastî ji kî pê dizane?

Dibe ku di nav mîletê me de tenê "damezrêner" çanda me bizanîn û ne dûr e ji iro û pê ve ewê bi tenê bi tipen girîng nivîsîn xwe yên girîng binivîsinin.

"Ez gundê xwe ji nû ve ava dikim"

Bi insiyatîfa Fransizekî ku bi eslî xwe Kurd e, di 6'ê Sibata 1993'an de li bajarê Hambye'ê şevel piştgiriyê bi Kurdistana Iraqê re hat amadekirin. Navê vê şevê "Ez gundê xwe ji nû ve ava dikim" bû.

Ev Fransiz ku navê wî Serge Mohuidin e havîna berê çûbû Kurdistana Iraqê û jinûveavakairina gundek ku ji alî Sadamê xwînxwar ve hatibû xerakirin wek armancek dabû ser milê xwe. Wî ji bo pêkanîna vê armancê li ser rewş û pêwîstiya gundiyan li Kurdistanê hinek lêkolîn çêkirine û ji bo daxuyanîkirina wan lêkolînan ji bo raya giştî ya Fransayê û bidestxistina hinek imkanen aborî ev şev amade kiriye.

Grûba muzîkê û folklorê ya Koma Zozan besdarî şevê bû stran û dilanen xwes pêşkêşî Fransizan kir. Di şevê de xwarînê Kurdi hatin firotin.

Rojen Xerzî /Fransa

Li Meclîsa Swêdê Pirsa Kurdi

Di dawîya meha Çileya Paşîn de parlamenteñer partîyen yên ku di Meclîsa Swêdê de ne, li ser Kurd û Pirsa Kurdan daxwaznamen curbucur pêşkêşî meclîsî kirin û ji hukûmetê daxwaz kirin ku ew hewlîbide di platformen navnetewî de pirsa Kurda aktuel bike û piştgirîya hukumeta Kurdistana Iraqê bike.

Ji van daxaznaman ya yekî ji aliyeñ Parlamentara Partiya Center Ingbrît Irhammar ji meclîsî re hat pêşkêşîn û parlamenteñer Partiya Moderat (Konservativ) Gustav Von Essen, Parlamenteñera Partiya Venster (Çep) Berith Eriksson, yê KDS (Partiya Demokrat ên Xiristiyan) Pontus Vîklund û ya Folkeparti(Partiya Gel) Karin Pillater ev daxwaznamen imza kirin.

Di daxwaznamen de ew daxwaz dikin ku

hukûmetê ku Swêd li YN bîkebite ku pirsa Kurd him ji aliyeñ mafêni mirovan û him ji aliyeñ mafêni gelan ve aktuel bike.

2- Meclîs berpirsiyari dide hu-kûmetê ku Swêd li prosesa KEHE û li Konseya Ewrûpa bîkebite ku Tirkîye bepirsiyariyîn ku li gor naverokên wan peymanen hevbes, hilgirtiye, bi cih bîne.

3- Meclîs wekî bîryara xwe berpirsiyari dide hukûmetê ku Swêd li platformen navnetewî yên pêwîst bîkebite ku agirbirîn û hevdîtin di navbena dewleta Tirkîye û gelê Kurd de pêk bê ji bo di pêşerojê de bi hev re jiyanekî bi aşîti bijîn

4- Meclîs berpirsiyari dide hu-kûmetê ku Swêd li YN bîkebite da ku YN rapportereke taybeti dest-nîşan bike ji bo mafêni mirova li Iranê.

5- Meclîs berpirsiyari dide

hukûmetê ku Swêd rewşa mafêni mirovan û Kurdên bêyî mafê hevwelatiyê li Sûriyê, bê taqîbkirin.

6- Meclîs berpirsiyari dide hukûmetê ku Swêd li YN'ê bîkebite ku ambargoya YN'ê ji ser Kurdistana Iraqê bê rakirin.

7- Meclîs berpirsiyari dide hukûmetê ku Swêd piştgirîya pêşveçûna demokrasiyê li Kurdistana Iraqê bike.

Daxwaznama duymen ji aliyeñ parlamenteñera Sosyaldemokrat Viola Furubjelke û de hevalen wê; Martin Nilsson û Ulrika Messing û daxwaznama sêyem ji ji aliyeñ Parlamenteñera Venster û dosta gelê Kurd Berit Eriksson ve hat dayin. Di herdu daxwaznamen de ji hukûmetê daxwaz tê kirin ku li swêdê buroyek informasyon ji bo Kurdan bê vêkirin.

RAMANÊN RAMANWERAN

Dewleta Qereqûşî

M. Eli

Tirkiye, welitekî wiha ye ku serokêni siyasi yêne miletê wê û gelek ronakbirêne wê yêne pêşkefti pesnê xwe didin û xwe pê serbilind dikin ku dewleta wan di herêma Rojhilata-Navîn de çiqas dewletera huqûqi û demokrat a pêşkefti ye. Gelek lêkolîn û lêgerin li ser vê yekê hatine kirin ku ev sed û pêncî sal in, dewleta Tirk di warê huqûqiya pozitif de berbi dewleterka Tirk hemdemî ve çi gav avêtine, çend kemiliye û çiqas bes bi huqûqiye nemaye, ber bi demokrasiyek Rojavayı ve pêste çûye. Lêkolîn, lêgerin û beyan nînin ku gava di vî warî de derketbin û behsa huqûqbûn û demokratbûnya dewleta Tirk nekin.

Di mesela demokratbûnê yan ji di ya dereca demokrasiyê de, dibe ku meriv rastî hin munaqeşe û fîkrîn ji hev cuda bê, lê di mesela huqûqiya dewletê de cihê şik û gumanê nehatiye hiştin. Rayek wiha hatiye bicikirin ku wesfîn dewleta huqûqi di nav dewleta Tirk de bicibûne û kemili ne. Her çendîn têkiliye ka gelek xurt û nêzîk di navbera huqûqi û demokrasiyê de hebe ji nayê wê manê ku ev herdû xusûsiyet her gavê bi hev re ne, ji hev veder nabin (venaqetin). Demokrasî bê huqûqiye nabe, lê li her cihê ku huqûqi û hebe nayê wê manê ku demokrasî ji heye. Huqûqi, zêdetirin zidê keyfiyetê ye. Hebûn û eşkeretiya qanûn, qâide û rê û dirban e, ji bo têkiliyên navbera însanan bi

bûyer û kar û bar pêk têne ku berpîsiyaren siyasi bi xwe, bi eşkereyî wan dikin, venasérin û di ser de ji pesnê xwe pê didin, ku di eslê xwe de ev bûyer, kar û bar bêhuqûqiya dewleta Tirk nîşan didin. Du bûyeren aktuel ên vê meha dawiyê hene ku vê yekê bi her awayî radixin ber çavê dinayê. Yek jê ew operasyon û girtin in ku pişti kuştina Ugur Mumcu hatin kirin. Pişti kuştina Ugur Mumcu li Stenbolê di netîca hin operasyonan de hin kes hatin girtin û di rojnaman de propagandeyek destpê kir ku, kuştina vî rojnamevanî û hin nîşkar û profesorê naskîri yê Tirk bi destê hin hêzîn İslâmî ye, ku ew ji bi dahfdana Îranê vê yekê dikin. Wezîrê Hundurîn ê Tirkîyê, pişti çend rojan waliyê Stenbolê û amîre emniyeta wê girt rex xwe û derket hemberî rojnamevanan, diyar kir ku, qatilên hin şexsiyeten

Dibêjin di dema Selçûqîyan de qadiyek hebû, jê re digotin Qereqûşî. Rojekê Qadî Qereqûşî di huzûra mehkema şerî de yek súcdar kir û fermana idamkirina wî derxist. Celadan merivé súcdar girt bir binê sépiyê, ben avêtin hustuyê wî, lê bejna mîrik dîrê bû, her cara ku kursî ji bin piyên wî kişandin, piyên mîrik gîhaştin erdê, nexeniqi. Çend caran ev yek tekrar kirin lê nebû. Celad derketin huzûra Qereqûşî, mesele jê re gotin. Qereqûşî li ser vê yekê li wan vegerand û got: "derkevin kuçê(kolanê), we kîyê bejn kin dît, hema bigrin bînin di şûna vî merivî de bidardekin".

navdar hatine girtin, di netîca itirafen wan de, rîexistinaka nuh a İslâmî hatiye keşifkirin ku têkiliye wê ji bi Îranê re heye. Her di wê demê de, mudümümî(sawciyê) ku li pey vê bûyerê bû, eşkere kir ku têra xwe delîl bi destneketine ku ev kes û ev rîexistin bîn súcdarkirin. Pêre pêre serokwezîr Silêman Demirel, beyan da û beyana mudümümî red kir, di ser de ji talîmatek da ku di bûyêrên wiha de divê hakim û mudümüm bi serê xwe beyanan nedîn, divê ev heq di destê meqamîn siyasî de be, hukûmet bi xwe beyan bide.

Di dewletek huqûqi de, yê ku karibe însanan û rîexistinan súcdar bike mehkeme ne, hakim in. Yê ku karibin beyanan bidin bê ka delîlen têra xwe ji bo súcdarkirina kesekî an rîexistinê heye yan nînin, îmkana vekirina daweyekê heye yan na mudümüm in. Di meselek wiha de, li nav dewleterka huqûqi, ne serokwezîr ne ji wezîre hundurîn dikare xwe têxe şûna hakim û mudümüm, mehkeman û hela hela xwe di ser wan re bigire. Heta qanûnê Tirkiyê bi xwe ji heta dereceyekê vê yekê destnîşan dikin. Lê ci xem e. Ev Tirkiyê ye mîratxurê dewleta Ali Osman e, gava li hesab were Silêman Demirelê "demokrat" ji, dibe

navdar hatine girtin, di netîca itirafen wan de, rîexistinaka nuh a İslâmî hatiye keşifkirin ku têkiliye wê ji bi Îranê re heye. Her di wê demê de, mudümümî(sawciyê) ku li pey vê bûyerê bû, eşkere kir ku têra xwe delîl bi destneketine ku ev kes û ev rîexistin bîn súcdarkirin. Pêre pêre serokwezîr Silêman Demirel, beyan da û beyana mudümümî red kir, di ser de ji talîmatek da ku di bûyêrên wiha de divê hakim û mudümüm bi serê xwe beyanan nedîn, divê ev heq di destê meqamîn siyasî de be, hukûmet bi xwe beyan bide.

Di çarçewa Tirkiyê de, bêpâriya milete Kurd ji maf û azadiyênil milî û însanî, şerî qirêj û ku li hemberî milete Kurd tê meşandin, infaz û işkencenê ku bê mehkeme têne kirin, li darxistina komplô û cinayetê ku di rêka kontr-gerilla û Hizbullahê de têne bicîhanîn, malwîrankirin û penaberkirina gundiyan bêsûc û bi sedan nimûnen wek van em bidin aliyeke, ku berpîsiyaren siyasi yêne Tirkiyê bi riya bi hezaran derew, fen û fût û riyakarî û bahanan, van bûyêran û inkar û tehrif dikin. Gelek


Sultan Silêman û wek kalikên xwe yêne padışah bi vî alî û wî alî de sûr li ba dike, qanûn manûn li ber wî namînin.

Bûyera din ji çendekî berê bi saya serê wezîrê tendurustî (sihî) gewimî. Kanaleke televizyonê ji di vê bûyêrê de li nik wezîr bûye, hemû bûyêr kîşabû filmê û piştre bi pesinandina wezîr ev bûyêr di televizyonê de nîşan da. Li gor televizyonê mesele wiha bû:

Wezîrê Tendurustî, çûbû Stenbolê û bîryar dabû ku biçe ne-xweşxaneyek teftîş bike. Berî çûyinî bi seat û nîvekê haya berpîsiyaren nexweşxanê pêxistibû. Lê gava çûbû nexweşxanê, li ber derî kesî pêşwazî lê nekîribû, ku çûbû hundur, dîstibû ku sertebîb nexweşxanê ne li nexweşxanê ye oda meqamî wî ji radaîi ye. Wezîrê tendurustî bi vê yekê gerek hêrs bûbû. Muhamîfîzîn wî hema di wê gavê de bi pihîn û lêdanê deriyê oda meqamî sertebîb perçê perçê kirin, wezîr efendi ji bi hêrs û ezamet ket hundurê odê. Televizyonê ji ev yek hemû xistibû film û bi pesindayinek mezin nîşanî hemwelatiyan da. Gava wezîr di ekran televizyonê de dixuya, fişefî ji pozê wî dihat û ji karmendîn nexweşxanê re digot "rewşa we hemûyan rezaleti" ye.

Ev bûyera ji bûyereka eşkere ye ku di nav dewleterka huqûqi de ne mumkune biqewime. Li her derê dînyayê, li hemû welatan dibe ku nexweşxaneyek pir di rewşek xerab de be, xizmetan nexweşan neke, sertebîbê wê súcdar be, karmendîk xerab be. Lê dewleterka ku piçek huqûqiyet pê re hebe wezîrê wê nikare bi keyfiyetek bêperwa, bi muhamîfîzî xwe deriyê oda sertebîb perçê perçê bike, weke eşqîya hucûmî hundur bike û televizyon ji vê yekê bike pesn ji wezîr re. Heke huqûqiyet hebe, qanûn hene, hakim hene, muftîşen karmandan (memûran) hene, rê û dirbên tehqîqatan hene ku di van rîyan re dikare bê tespitkirin ka ev sertebîb súcdar e yan na, heke súcdar be ji mustehqî çiye? Lê na, li welitekî wekî Tirkiyê, gelek caran mirasa Osmanîji huqûqiyetê pirtir di rewacê de ye. Loma ji gava ji wan re lazim be, ne ku memûr û polis û buroqratîn wan, wezîr û serokwezîren wan ên herî "huqûqşinas û demokrat" ji dibin qadiyê Qereqûşî. Çiroka "Hukmê Qereqûşî" çirokeke meşhûr e.

Dibêjin di dema Selçûqîyan de qadiyek hebû, jê re digotin Qereqûşî. Rojekê Qadî Qereqûşî di huzûra mehkema şerî de yek súcdar kir û fermana idamkirina wî derxist. Celadan merivé súcdar girtin birin binê sépiyê, ben avêtin hustuyê wî, lê bejna mîrik dîrê bû, her cara ku kursî ji bin piyên wî kişandin, piyên mîrik gîhaştin erdê, nexeniqi. Çend caran ev yek tekrar kirin lê nebû. Celad derketin huzûra Qereqûşî, mesele jê re gotin. Qereqûşî li ser vê yekê li wan vegerand û got: "derkevin kuçê(kolanê), we kîyê bejn kin dît, hema bigrin bînin di şûna vî merivî de bidardekin".



Zinarê Xamo

Ronakbîr

Gelek caran gotina "ronakbîr" (entellektuel) û "nîşkar" di yek maneyê de tê bikaranîn. Li gor vê dîtinê her nîşkar, her şair, bi kurtî her kesê ku bi kar û barê nîşê mijûl dibe û xwe "nîşkar" qebûl dike di eyñî wextê de ronakbîr e ji. Gava norm ev be, bivê nevê hemû "nîşkar" Kurd ji otomatîkman dibin "ronakbîr" Kurd. Ü qelstiya wan a senetkarî û edebî ji dibe wek "bêsewyetiya" ronakbîr Kurd.

Bi vê pîvanê, heger nîşkar merivekî zana, bi kultur û xwedîyê berhemê bi sewiye be, wê gavê ew ronakbîrekî hêja ye, sewiya wî bilind e. Na ku heger berhemê hatiye afirandin ji alî edebî ve mustewa wê ne bilind be, ev ji tê wê manê ku xwedîyê berhemê ne ronakbîrekî baş e, sewiya wî nîzîm e. Lema ji tê gotin ku "sewiya ronakbîr" Kurd nîzîm e, meriv nikane wan bi yên xelkê re muqayese bike" Ev ji ji bêqalîtetiyâ berhemê wan tê.

Li vir zeîfi û bêqalîtetiyâ nîşkarê Kurd wek "bêsewyetiya" ronakbîr Kurd tê dîtin. Di vir de divê meriv ji xwe bipirse:

Gelo ronakbîrî ci ye û meriv li gor ci dibe ronakbîr? Meriv vê sifetê li gor xwendin, kultur, zanîna û nîşkariya xwe digre ya ji têkiliya wê bi "ûjdan, exlaq" û praktilîka meriv re heye?

Wek tê zanîn terma "ronakbîr" berê ji bo kesen ku bêtir bi "karêfî" mijûl dibûn, dihate gotin. Lê iro ev çerçewe pîrteng e. Wek gelek termen din, terma "ronakbîr" ji ev mana xwe ya teng ji zû de li pey xwe hîştiye. Iro êdî diplome, zanîn, nîşkarî bi serê xwe sifetê "ronakbîr" nade meriv. Nade, ji ber ku ronakbîr "tipêk e, nîşkarî senetek e." Meriv bi senetê xwe nabe ronakbîr. Meriv dikane ronakbîrekî hêja be, bêyî ku berhemek meriv ya nîşkarî ji hebe. Ya ji dikane nîşkarekî bi nav û deng be, lê cardin ji ne ronakbîr be. Li dînyayê numûnê wiha pir in. Gelek nîşkar û hunermendîn mezin bi şêlîn xwe yên siyasi û ideolojîk kursiya ronakbîrî ji bin xwe virviridine.

Her wisa, her berhem ji, mustewa wê ya hunerî çuqasî bilind dibe bila bibe, tenê ji ber vê yekê "ne" berhemekî ronakbîrî ye. Lê hin "berhem hene ku xebatê ronakbîr" ne û nîşkarê wan ji ronakbîr in.

Mesela, Kemal Bûrkay, Nacî Kutlay, Malmîsanij, M. Emîn Bozarslan, Rohat, Mûrad Ciwan û gelek kesen wek wan, him bi kirinê xwe û him ji bi berhemê xwe ronakbîr in. Çimkî jiyan û eserîn wan hev û du temam dikin. Her yek ji wan li gor qabilîyet û zanîna xwe rastî parastiye, bûye hevalbendê rastî û heqîye. Ew li dij zulmê, zorê, neheqîye derketine. Ji bo vê yekê hin ji wan ketine hefsan, eziyet û cefa dîtine. Yanî wan di jiyanê de ji wek ronakbîrekî hereket kirine. Heger di jiyanê de ji li gor berhemê xwe hereket nekirana, li hember bindestiya millete xwe bê deng bîmana, tenê ji xwe re bi karê xwe yê nîşkariye ve mijûl bibûna, bê guman me yê ji wan re negotia ronakbîr. Lê vê yekê nîşkariya wan pûç nedikir, ew dîsa dikanîbûn nîşkarê baş bûna.. Ev başi ne îspata ronakbîriya wan, lê ya senetê wan e.

Tişt ku meriv dike "ronakbîr" ne tenê eserek baş û hêja ye; jiyan e, praktilîka e ji. Ji ber vê yekê ji çawa ku şairek, tiptorek, sosyologek, zimanzenek dikane bibe ronakbîr, her wisa karkirek, mustîyek, şêsek û terziyek ji dikane bibe ronakbîr. Ji bo girtina sifetekî wiha ne hewcye ku wan roman û şîir nîşsandibin. Di vî warî de li welaîe me gelek numûnê hene. Ma ki dikane bîbêje Mehdi Zana, Şêxmûs Cibrân û bi hezarân kesen wek wan ne ronakbîr in? Ma ji ber ku ew ne nîşkar in, ne ronakbîr in ji?

Bêşikci ronakbîr in. Him ji ji gelek "nîşkar" bêtir ronakbîr in. Nîşkarî, zanîn, kultur, axaftina bi çend zimana tenê meriv nake ronakbîr. Ger wiha ba divê Tarik Bûgra û gelek kemalisten wek wî ronakbîr bûna. Çimkî li gor gelek ronakbîr me, ew hîn zane ne û berhemê bi qalite ji nîşîne. Lê cardin ji ew ne ronakbîr in. Fejet î. Beşikci ronakbîr e. Di vî warî de meriv dikane gelek numûnan ji Kurdan ji bide.

Ronakbîr giş ne ji kokekê ne, her yek ji nav sinif û tebeqakê têne. Her çiqas hin müşterekê wan hene ji, lê dîsa hemû ne xwedîyê yek senetî ne, siyasetek û ideolojîye müşterek naparîzin, interesen wan cihê ne. Lema ji wek sinifekê, wek kategoriye meslekî nikanin di bin baskê, xistinê de bêne ba hev.

Kesê ronakbîr újdanê millet e. Divê ew him bi praktilîka xwe û him ji bi nîşen xwe (helbet gava nîşkar be) li dij zulmê, zorê, neheqîye derkeve. Hevalê heqî û rastiyê be. Nebe hevalê dewleter, li hember bêedaletiyê ne kerr û lal be; ne kor be.

Li alî din divê meriv ji her kesen ku ji xwe re dibêje ez "nîşkar" im, nebêje nîşkar, bi çavê nîşkariye li wan nîre. Çimkî gelekên wan ne "nîşkar" û ne ji "ronakbîr" in; pîr pîr kesen "xwenda ne", hewqas..

Lehceyên Kurdî

Zimanê Kurdî yê ku li ser axeka fireh tê axaftin, ji gelek lehçeyan pêk tê. Tiştên ku li ser lehçeyen kurdî hatine nivîsin û axaftin gelek ji hev cuda ne. Di vî warî de meriv rastî tesbîten ji hev gelek cihê û agahdariyên zêde têkilhev tê. Ji ber ku gelek caran navên lehce, herêm, eşir, dîn û mezheban têne têkilhevkirin, di ber çavkaniyekê de, ji bo lehcan meriv dikare rastî naveki cihê bê. Ev yek ne bes ji alî eserên lêkolîneran, lê ji alî Kurdan bixwe jî wiha ye. Lehce, gelek caran ji alî Kurdiyaxêvîn vê lehçeyê û ji alî cîranê war bi navê wê herêm, eşirê, mîrîtiyê yan wî dîn û mezhebi hatine binavkirin. Di netica vê yekê de, ji bo lehçeyekê çend navêni ji hev cihê derketine meydanê. Her weki navê lehca Kurdiya bakur, li **Kurdistana İranê Şikakî**, li **Kurdistana İraqê Bahdînî**, li **Kurdistana Tirkîyê**, li **nik Kurdiyaxêvîn vê lehçeyê Kurmancî û li nik Dimiliyan (Zazayan)** Kirdasî yan jî Herewere ye. Navê Kurdiya navendî, li **Kurdistana İranê Mukrî**, li **nav perçen bindestê Tirkiyê û Sûriyê û li nav Bahdînan, Soranî ye**. Lehceya ku li hin herêman bi navê Zazakî tê nasîn, li nav Kurdiyaxêvîn vê lehçeyê li hin herêman ji Dimîkî, Kirdî, Kirmancî yan jî Sebê tê binavkirin. Di çavkaniyan de, em rastî wê yekê tênu ku ji Hewremanî re, **Goranî, Kakeyî, Hewramî, Maço**, yan Kurdi tê gotin. Di nav lehçeyen Kurdi de kîşmekêşya herî diyar di warê Goranî, Lurrî û Zazakî de ye. Hin kes hene ku van hersiyan wek lehçeyekê dihesibîn û dibêjin ku ev şêweyên lehçeyeka zimanê Kurdî ne. Hinekan jî ew wek zimanêna cuda yê serbixwe qebûlkirine. Kesin hene ku hersiyan; wek lehçeyen cuda yê zimanê Kurdî dihesibîn û hin jê jî ya duduwan (Lurrî) li dervayî zimanê Kurdî dibînin. Lurriya ku bi navê Lurriya Piçûk û Lurriya Mezin dabeş diye, hin kes jî hene ku Lurriya Mezin lehçeyeka Kurdî qebûl nakin (*di nav van de hin kes, wê wek lehçeyeka zimanê Farîsî dibînin, hin jî wê wek zimanekî bi serê xwe nîşan didin*) lê Lurriya Piçûk wek lehçeyeka zimanê Kurdî qebûl dikin.

Meriv nikare bêje ku li ser lehçeyen têra xwe lêkolîn û lêgerîn hatine kirin û netîcênel zelal ji alî van ve bi her awayî hatine bidestxistin. Em ê li vê derê li gor çavkani û wesîqeyen bin destê xwe cih bidin hin dîtinan û şemayekê diyarbikin ku li gorî me ya herî néztir a rastiyê ye.

Di warê lehçeyen Kurdî de kevintirin çavkani, Şerefna-

Zimanê Kurdî

-II-

meya Şeref Xan e. Şeref Xan di vê esera xwe de wiha dinivise.

"Eşîr û civakên Kurdan, ji alî ziman, adet û rewşa civakî ve bi ser çar beşan de dabeş dibe:

*Beşê yekê, Kurmanc
Beşê duduyan, Lor (Lurr
M.C.)*

*Beşê sisiyan, Kelhur
Beşê çaran, Goran." (3)*


Heger, em vê tesbîta Şeref Xan nehesisibîn, lêkolînêni li ser lehçeyen Kurdî heta nîvê pêşin ê vê sedsala me, di esasî de ji alî biyaniyan ve hatine kirin. Di vê meselê de takeîstisna, ew broşura Mela Mehmûdê Bayezidî ye ku di 1858'an de ji bo Aleksander Jaba; konsolosê Rûsyâ Qeyserî yê Erzurûmê amade kiribû û ji ferhenga Şêwa Hekarî û ya Rewendî ya hevberkirî pêk hatibû. Mela Mehmûdê Bayezidî, di destpêka vê broşurê de, berî ku ji alî rîzimanî ve li ser hin xalan raweste, dide diyarkirin ku zimanê Kurdî jî ji ber ferqîtiyên herêmî û eşirî xwendiyê lehçeyen cuda ye. "mesela" dibêje, *"Kurmanciya ahaliyê Wanê, Mûşê, Bayezidê û Qersê û Kurmancêni bi ser Rûsyâ û İranê ve û zimanê ahaliyê Botan, Hekariyan, Hemedanê, Simtî(?)yê, Diyarbekirê, Mûsilê, heta bigîhê hudûdê Bexdayê* (ku ji herêmân Silêmanî û Şarezorê û ji taifîn Zerza, Mukrî, Bebe û Bilbasan pêk tê) ji hev cuda ne" (4) Mela Mehmûdê Bayezidî di vê xebata xwe de, Kurdî bi navê Kurmancî bi nav diye, wek lehce ji behsa navê Botan, Hekarî û Rewendî dike û di ferhenga xwe ya hevberkirî de ji şêweyên Hekarî û Rewendî hevberî hev dike.

G. Givrinliyê ku di salên 1836- 1837'an de çend meqale li ser ziman û etnografiya Kurdan belav kirin, zimanê Kurdî, bi navê Kurdiya jorîn û ya jérîn dike du beş. Li gor Givrimî Kurdiya jorîn ji Mukrî, Hekarî, Şikakî û Bayezidî, Kurdiya jérîn ji ji Lurrî, Gelhurî, Lekî û Goranî pêk tê. (5) Peter Lerch ji di xebata xwe ya bi navê *"Forschungen über die Kurden und die Iranischen Nardchöldaer"*, (Petersburg, 1857-1858) de zimanê Kurdî bi ser lehçeyen Zazakî, Kurmancî, Kelhurî, Gûranî û Lurî dabeş diye. (6)

Yek ji wan lêkolîneren zimanê Kurdî; Oskar Mann, Kurdî bi navê Kurdiya Rojava, ya Rojhîlat û ya Başûr dike sê beş. Oskar Mann ê ku Zazakî

bi ser Goranî ve dihesibîne, Goranî ji derdixe dervayî zimanê Kurdî. (7) Hin zimannasên biyani yê ku piştî Oskar Mann hatine, ji dêlva ku lêkolînênuh ên berfireh li ser lehçeyen zimanê Kurdî bikin, bizzat xwe sipartine xebatên Oskar Manni û birûbaweriye wî ducar kire. Karl Hadank yek ji van kesan e. Wî xebata Oskar Manni ya ku di sala 1907'an de bi navê *Kurdish Persich Forschungen Mundarten Gûran besonders, Kandulai, Auramani und Badschalani*, li ser Goranî kiriye, anîye careka din di ber çavan re derbas kiriye, hî şirovekirin û têbînî lê zêde kire û ji nuh ve çap kiriye. (8)

Dr. Mac Kenzie yê ku Goranî wek zimanekî serbixwe qebûl dike, di meqaleya xwe ya bi navê *"Reh û Rêcika*



Zimanê Kurdî de ku sala 1961'ê di rapora salane ya Komela Zimanî de hat belavkirin, Kurdî bi xwe jî yek ji lehçeyen Farisiya Navîn dihesibîne û di xebata xwe ya bi navê *"The Dialect of Auraman (Hawramani-Luhan) de Hewramanî, Kurdi nehesibandiye, wek lehçeyeka Farisiya Kevn hesibandiye."* (9) Dr. Mac Kenzie, zimanê Kurdî jî kiriye du beş û navê Kurmanciya Jorîn û ya Jérîn li wan kiriye. Kurdiya ku li deveren Silêmaniye, Hewlîre, Rewanduzê û li Xoşnawê tê axafîtin wek Kurmanciya Jérîn qebûl kiriye û devoka Silêmaniye. Devokên Aqre û Surçiyê ji wek bingeha Kurdiya deveren Aqre, Surçî, Amêdiye, Berwar, Bala, Gullî, Zaxo û Şêxanê qebûl kiriye. (10)

E. B. Soane, di esera xwe ya bi navê *"Grammar of Kurmanji or Kurdish Language"* (London, Luzak and Company, 1913) de zimanê Kurdî, beşî bi ser sê lehçeyan kiriye û ji her du lehçeyen

pêşin re gotiye lehçeyen bin gehîn. Dabeşkirina Soaneyî wiha ye:

- a) Kurmanciya Jorîn
- b) Kurmanciya Jérîn
- c) Lurrî, Zazakî û tevî ku nêzîkî hev in jî Hewramî û Guranî. (11)

Sosyologê Tirk, **Ziya Gökalp** Diyarbekirî di wê esera xwe de ya ku navê wê

"Kurt Aşiretleri Hakkında Sosyolojik Tetkikler" (Lêkolînê sosyolojik derheqê eşirîn Kurdan de) e û di 1922'an de li ser daxwaza hukûmeta Tirk ji bo ku di proja îşkankirina eşîran da bê bikar anîn, hatibû amadekirin û piştî jî di 1975'an de ji alî *Komal Yayinevi*, di 1992'yan de ji ji alî Sosyal Yayınları li Tirkîyê hatibû çapkîrin, Kurdan bi navê kurmanc, Zaza, Soran, Gûran (Goran) û Lur dike pênc qewm, tevî ku dibêje ku hê tehqîq nekiriye ji lê zimanê Gûranî û Zazakî nêzîkî hev in. Di tehqîqa cara pêşin a rapora xwe de Ziya Gökalp dibêje zimanê Bextiyarî dikare iltîhaqî Soranî û zimanê Kelhurî jî iltîhaqî Gûranî bêkîrin. Lê di tehqîqa cara dawîn de vê yekê tashîh dike û dînivise ku *"bi şâhidiya Şerefnamê tê famkirin ku zimanê Bextiyarî diçe ser Lurrî û zimanê Kalhurî jî diçe ser Soranî"*. (12) Ziya Gökalp di tehqîqa xwe ya cara pêşin de dînivise ku *"Heke em zimanê Gûranî, Bextiyarî û Kelhurî veder kin (veqetînîn) di destê me de çar zimanê serbixweyiya wan diyar, dimîne: Kurmancî, Zazakî, Soranî û Lurî"* (13) Lê di lêkolîna xwe ya rastî kiriye ya cara pêşin de digihê wê encamê ku *"Çawa ku Gûranî, Zazakî û Dunbulî navê cihê yê zimanekî ne, Kelhurî, Babanî û Soranî jî navêna cuda yê zimanekî ne. Bextiyarî û Lurî jî her navê zimanekî destnîşan dikin. Sedemê pirhejmariya na van ew e ku navêna muayen ên qewmîn Kurdan nînîn. Loma jî tê famkirin ku Kurd ne qewmek, lê çar qewm in û Kurdî jî dabeşî bi ser çar zimanê wiha dibe ku mensûbîn van zimanî qet ji hev tê nagîhîn. Ev çar ziman ev in: Zimanê Kurmancî, Zimanê Zazakî (Gûranî, Dunbulî), Zimanê Soranî (Bahdînî, Kalhurî), Zimanê Lurî (Bextiyarî, Feylî)" (14)*

Ziya Gökalp di wê xebata xwe ya binavkirî de wiha dînivise: *"Xwediyê van herçar zimanî ji zimanê hev tê nagîhîn. Ji alî serf, nahw û luxet ve ferqîka mezin di navbera wan de heye. Ferqîn navberê*

jî ne ferqîn lehçeyî, lê yê zimanî ne. her zimanek ji van her çaran ji alî zimannasî ve zimanî serbixwe ye. Her yek jî ji gelek lehçeyan pêk tê.

Tevî vê ji ev her çar ziman bi tevayî ne dûrî hev in jî. Hemî şaxen Kurdiyeka Kevin in ku meriv dikare bi navê "Kurdiya Qedim" bi nav bike. Têkiliyên navbera zimanê Neo-Latinî û Latinî ci bin, yê navbera Kurdiya Qedim û van Kurdiyan jî ew in." 815)

Ziya Gökalp ku lêkolînê wî li ser eşirîn Kurda ne li ser "lehçeyen" Kurmancî jî radiweste: "Hê bi tetqîke ilmî nehatîye derxistin ku zimanê Kurmancî dabeşî bi ser çend lehçeyan dibe. Lê gava Ahmedê Xanî di kitêba xwe ya bi navê Mem û Zîn de behsa lehçeyen ku bi kar tîne dike, di beyta jérîn de navê sê lehçeyan dijmîre.

"Bohtî û Mehmedî û Silivî Hîn lal û hinik ji zér û zîvî" (16)

Li gorî vê, Ziya Gökalp ji Kurmancî bi navê Bohtî, Mehmedî û Silivî dike sê beş û eşir û herêmân ku bi van "lehçeyan" diaxivin dihejmîre.

3) Şerefhan, Şerefname, Hast Yayınları, 3. baskı 1990, İstanbul, Wergera M. Emin Bozarslan ji Erebî bo Tirkî, r. 20

4) Vocabulaire Kurde des dialectes de Hakiari et Revendi, Par A. Jaba Consul de Russie à Erzeroum, Erzeroum le 15 mars 1858. Ji Dr. Marif Xeznedar Le Babet Mêjûyi Edebî Kurdiyewe 1984, Bexda r. 386'yan hatîye wergirin.

5) Mehemed Emin Hewremanî, Zarî Zimanî Kurdi Le terazûyi Berwîda, 1981 Bexda, r. 52

6) Peter Lerch, *Forschungen über die Kurden und die Iranischen Nordchöldaer*, Petersburg, 1857-1858, r. 72

7) Gotûwejek legel Dr. Kemal Fûad, beşî 2., Sirwe, hejmar 39, rezberî 1368

8) Mehemed Emin Hewremanî, Zarî Zimanî kurdi le Terazûyi Berwîridda 1981, Bexda, r. 24

9) e. n. d. r. 6

10) Sadiq Behaeddin Amîdi, Rêzimana Kurdi, Kurmanciya Jérî û ya Jorî ya hevberkirî, çapa yekê, 1987, r. 34

11) e. n. d. r. 27

12) Ziya Gökalp, *Kurt Aşiretleri Hakkında Sosyolojik Tetkikler*, Sosyal Yayınları, 1992. r. 24

13) e. n. d. r. 24

14) e. n. d. r. 95-96

15) e. n. d. r. 24-25

16) e. n. d. r. 28

(Dom dike)

Naskirin û hevaltiya min û Necmeddin

◆ İbrahim Guçlu

Di Tebaxa 1992'an de, bi amadekariya Şervan Buyukkaya, name û bîranînê rojane yên Necmeddin Buyukkaya, di pirtuka "Kalemimden Sayfalar" de hat weşandin. Ez bi vî karê Şervan gelek kîfxweş bûm. Lewra, piraniya welatparêzîn hemû beşen Kurdistanê, Necmettin Buyukkaya kêm zêde nas dikin. Lî ji ber ku heta şehîdketina wî, tu nivîsarên wî belav nebûn; loma jî wilatparêzîn Kurdistanê nîrînên wî bi giştî nasdikirin. Ew jî dibû sedem ku herkesik li gora argûmenten xwe nîrînên Necmettin Buyukkaya. Ji xwe re şirove dikirin. Vê jî bi xwe re neheqî, şaşî, tevlihevi û mübalaxa dianî qada munâqşeyê. Ez di destpêk de Şervan pîroz dikim û li ber bîranîna Necmeddin bi rîzgirtinê radiwestim.

Pirtük 504 rûpel e. Dema ku mirov li naveroka pirtükê dinêre, ji bona ku nivîsarên rojane û bîranîn in, li ser pirsan bîr û rayêne kûr tê de cih negirtine. Ev tiştekî gelek normal e jî. Lî di pirtükê de ji gelek meselîn tevgera Kurdî jî, ji gelek rîxistinê hemû beşen Kurdistanê û di nav van de jî li ser Ala Rizgariyê û şexsê min jî, gelek bîr û ray hatine diyarkirin. Helbet dema yê pirtükê dixwîne, dixwaze dîtina muhatabîn rexneyan jî bizanibe. Ji derveyî wê jî, ji bo ku nîrînên Necmeddin hewcedarî rexne û munâqşan e. Ez jî dixwazim ji bo vê yekê alîkîriya destpêkê bikim. Her çiqas ev destpêk dereng jî bê ditin, pêwist e.

Necmeddin di name û bîranîn xwe de, li ser gelek pirsan rawestîya ye. Li ser van pirsan gişan û bi kûranî rawestandina min gelek zehmet e. Ez dixwazim di çarçewa vê nivîsara xwe de, bi giştî li ser pirsan rawestim.

Ez, di 1967'an de ketim Faikta Huquqê ya Enqereyê. Disinifa dawiyê ya Lîsê de, pêwendiyên min bi wilatparêzîn Kurd yên xwendekar re çebûbûn.

Ew kesen wilatparêz yên ku min li Enqerey nas dikirin, piranî endamên Partiya Karker ya Tirkîyê û komela xorten şoreşger FKF'ê (Federasyona Kulûbîn Fikrî) bûn. Demek dirêj neçû, min wilatparêzîn Kurd yên li Stenbolê jî nas kirin. Necmeddin jî, yek jî wan bû. Ez jî, di destpêk de enda-

mî Partiya Karker û FKF'ê bûm; Necmeddin jî. Heta sala 1969'an jî, hevdûnasîna me di vê çarçewê de dom kir.

Di sala 1969'an de dema ku di nav xort û rewşenbîrên cep yên Kurd û Tirk de cûdabûyinê dest pê kir, biryar hat girtin ku rîxistineke Kurdî bê ava kirin. Ji bo damezrandina vê rîxistinê, Necmeddin li Stenbolê yek jî wan bû ku xebat dikir. Min jî ji bo damezrandina vê rîxistinê, li Enqereyê xebat dikir. Xebata Enqereyê û Stenbolê girêdayî hevûdu dihat meşan-

jî yek jî wan bû.

Necmeddin ci di Partiya Karker û FKF'ê û ci jî di DDKO'yê de gelek bi aktîvî kar dikir.

Di nav têkoşîna xort û wela-tparêzîn Kurd de jî bîr û rayêne cûda derketin holê. Gelek endam û berpirsiyaren DDKO ya Stenbolê, bi partiya Dr. Şivan, Partiya Demokrat ya Kurdistanê li Tirkîyê re pêwendî danibûn. Wek di rûpel 11'an de tê behskirin, Necmeddin derveyî van kesan bû. Dîsa wek di eyîn rûpela pirtükê de jî tê behskirin, ji bo ku pêwendiyen Necmeddin bi



Ji milê çepê ber bi rastê İbrahim Guçlu, Mele Eware û Necmeddin Buyukkaya li Kurdistanê Başûr

din, ji bo vê yekê jî; xebatkar û damezrênerên vê rîxistinê ji nîzîk ve hevûdu naskirin. Demek dirêj derbasî nebû, ew xebata bi ser ket û DDKO (Devrimci Doğu Kültür Ocakları) hatin damezrandin. Necmeddin damezrênerûk û serokê DDKO destpêkê bû. Wê demê pêwendiyen wî û min, bi Partiya Karker re jî dom dikirin, lî bi FKF'ê re ji aliye pratîk ve pêwendiyen me neman. Pişti demek FKF'ê di kongra xwe de gelek kesen Kurd ixraqa kirin. Mumkun e ku Necmeddin

Partiya Karker û çepen Tirk re hebûn, Dr. Şivan û hevalen wî bi Necmeddin re pêwendî danibûn û xwestibûn ku wî ji DDKO'yê jî bi dûr xin. Ji bo vê yekê jî, her çiqas di wan şertan de ew endamekî jîr bû jî, lî dîsa jî berpirsiyaren DDKO'yê nedixwastin tu wezîfe bidin wî. Mirov dikare bibêje ku beriya darbeya 12'ê Adarê, Necmeddin bi hatibû tecrifkirin. Lî, Necmeddin qasî jê dihat kar û xebatên xwe didomand: wê demê ew ne berpirsiyare DDKO'yê bû.

Dema ku di İlona 1970'î de ez û gelek endam, damezrêner û rewşenbîrên Kurd em hattin girtin; ji bo Necmeddin jî tewqîf hatibû birin, lê Necmeddin nekete dest. Sedema tewqîfa wî jî, axaftina wî ya di Kongreya DDKO ya Enqerey de bû. Di eslê xwe de Necmeddin Buyukkaya wê demê beşdarî kongra me nebûbî.

Hevalekî ku paşnavê wî nîzîkî yê Necmeddin bû, beşdarî kongrê bibû. Axaftinê ku li kongrê hatibûn kirin, ji aliye "Komiserê Hukumetê" ve bi bandan hatibûn qeydkirin. (Çimkî li gora Qanûna Komeleyeti ya Tirkîyê wê demê bi navê hukumetê kesek beşdarî kongrê dibû Kongre taqîb dikir û Necmeddin jî ji aliye dezge-hîn dewletê ve istîxaratê ve dihat naskirin, ew axaftin, kirin malê Necmeddin).

Dema ku Necmeddin firar bû jî, di wan şerten gelek zehmet de carekê li Enqerey, hate hepsî serdana me jî. Bi rastî em hevalen ku di hepsî de bûn, em ji wî gelek eciz bûn û me ew rexne kir. Bi rastî jî ew helwêsta (şela) Necmeddin, helwêsteka pir bi cesaret bû û belki jî gelek bibêjin macera.

Necmeddin pişti darbeya leşkerî ya 12'ê Adarê, derbasî Başûrê Kurdistanê bû: Beriya ku derbasî Kurdistana Iraqê bibe, bi awayekî ji me re xeber şand. Em jî bi çuna wî kîfxweş bûn. Dema ku Necmeddin çubû Başûrê Kurdistanê, Dr. Şivan û hevalen wî li wir bûn û bingehîn wan yên leşkerî hebûn; Necmeddin jî li cem wan mabû. Wek di rûpel 17'an de ew bi xwe jî diyar dike, di 10'ê Tirmeha 1971'an de dibe endamê PDK-Li Tirkîyê.. Wê demê ez û gelek wilatparêzîn Kurd, em li Diyarbekirê di hepsî de bûn. Ji bo vê yekê jî, pêwendiyen min, bi Necmeddin re qut bûn.

Pişti bûyera ne xweş ya kuştina Seid Elçi, Dr. Şivan, Çeko û Brûsk; Necmeddin û hevalen xwe derbasî Sûriyê bûn û gelekîn wan jî ji wir derbasî Ewrûpayê bûn. Dema ku ew li Ewrûpayê jî bûn, Necmeddin dev ji kar û xebatên xwe yên wilatparêzî ber neda. Lî girêdayî nakokiyen hêzén Kurdistanâ Iraqê, pirsa Seid Elçi, Dr. Şivan, Brûsk û Çeko; li Ewrûpayê jî di nav Kurdan de nakokiyen gelek ne xweş diqewimîn. Necmeddin jî di van bûyera de terefekî tûj bû, beşdarî gelek şerîn ne xweş jî

bibû. Vê jî em gelek diêşan-din.

Pişti 'efa 1974'an -ku bi riya Hukumeta CHP û Millî Selamet û Dadgeha Qanûnabingehî-ilan bû; imkan çêbû ku gelek kes vegerin welêt. Lî gelek mirov venegerîyan welêt; Necmeddin û çend hevalen wî bi kîfxweşî û bi plan û program vegeriyen.

Necmeddin roja ku vege-riya Tirkîyê dest bi xebata xwe ya wilatparêzî kir. Wî û hevalen wî, PDK-Li Tirkîyê ji nû ve damezrandin. Piş re xebata wan li ser navê DDKD'ê hate naskirin û bû xebateke xurt jî. Lî di wê demê de dijitiya wan û partiya Seid Elçi jî dom dikir. Necmeddin û partiya wî gavên mezin davêtin. PDK a Tirkîyê, girêdayî şikestina tevgera Başûrê Kurdistanê, rexnen li ser Berzanî û PDK-Iraqê, nedîkarî gavên ciddî bavêjin. Lî pişti ku sosyalîzmî li ser wê partiye jî tesir kir û gelek ka-droyen xwendevan yên cep ji ketin nava PDK a Tirkîyê, di rewşa wê de jî guhartîn çêbû. Lî vê carê jî, ew perçe bûn...

Pişti ku Necmeddin vege-riya Tirkîyê û wî û hevalen wî ji nûve partiye damezrandin, me ji wek grûbeke siyasi kar dikir. Dema ku di sala 1976'an de me xwest em kovara Rizgariyê biweşînin, ji bo ku em pişgiriya wilatparêzîn Kurdistanê bigrin, me bi gelek wilatparêzîn Kurd re pêwendî danîn û bi wan re pirsa weşanê munâqşeye kir; me pêşniyarên wan girtin û me ji wan xwest ku ew jî beşdarî vî karî bibin. Wê demê, wek gurup me bi KIP'ê (Partiya Karkerî Kurdistan) re jî pêwendî danî, me bi wan re jî pirsa Rizgariyê munâqşeye kir û fikrîn wan girtin. Li ser navê KIP'ê ji sê kesan yek jê Necmeddin bû ku ji bo vê pîrsî bi min re rûnişt. Di wê civînê de min pêşniyar kir ku heval jî beşdarî weşana Rizgariyê bi-bîn. Necmeddin û herdu hevalan din, li dijî xebata me ji der-neketin, lî payîn û taqîbkirina pêvajoya weşanê pêwist dîtin.

Dostaniya min û Necmeddin jî her dom dikir. Ji bo ku Necmeddin jî zû de li Tirkîyê nedîma; loma car caran me hevûdu didit. Lî dema ku Necmeddin ji KIP'ê neqetiyabû ji bi gelek awayan ne-râzûbûn û rexnen xwe diyar dikir. Ew gîhiştîbû wê qenaatê ku rîxistin û grûbîn heyî, ji pirsa Kurd re nikarin pêşengiyê bikin; ji bo vê yekê jî damez-

'Rûpelin ji Qelema Min"



"Di Hezîrana 1979'an de ez û Necmeddin cûn Başûrê Kurdistanê"

randina partî an jî rîxistîneke siyasi ya nû pêwist didit. Ji bo vê jî metoda wî ew bû: Ew kadroyen "girîng", "hêja", "jêhatî", "zana" û "şoreşger" yênu ku di nav rîxistin û partîyên siyasi de cihê cihê cî girtine; pêwist e ku bikevin nav pêwendiyek veşartî û bi vê riyê xwe bi hêz bikin; pişt re ji bo rîxistîneke nû gav bavêjin. Ez bi xwe li dijî vê metodê bûm. Li gor bîr û baweriya min, ev metodeke komployî û provakatîf bû. Ez di wê fikrê de bûm ku ev metoda komployê û provakatîf bûbû sedem ku Dr. Şivan ji xwe re grûbeke dizî çêke, wisa jî nebe endamên PDK a Tirkîyê. Ji kuştina xwe, Seid Elçi, Brûsk û Çeko re jî bingeh pêk bîne.

Necmeddin di nameyeke xwe de (rûpel 76) diyar dike ku li gor metod û programa xwe, Rizgarî jî daxîl, bi gelek endamên grûb û partîyan re pêwendî daniye. Lîbelê dîsa dibêje ku "...ez nikarim bibêjim ku min encamên baş girtine."

Min ev fikrîn xwe vekirî ji wî re jî digotin. Bi raya min, ew hevalên ku pêwistiya rîxistîneke nû û yekîtiya welatparêzîn Kurdistanê didit; diviya vekirî di nav grûb, partî û rîxistinê xwe de wê pirsê bidana munaqesekirin û heta ji me dihat, ew kesen ku li dijî vê prosesê ne jî biguherandana û ew qanî bikirana. Di encama van munaqesên me de, Necmeddin ji bo yekîtiya rîxistîneke ji me re bi riya Rûşen Arslan (Necmeddin di rûpela 66'an

de ji hevûditina xwe û Rûşen behs dike) pêşniyar anî. Ji bo vê jî, bîryar hatîbû girtin ku em hevûdu bibînin, li ser vê pirsê qise bikin. Lîbelê, ji bo ku Necmeddin li Tirkîyê nedîma, me (Min û Rûşen) û wî, me nikarîbû hevûdu bidîta; ew nehat randewuya xwe. Pişt re jî, ji bo ku Necmeddin ji partiya xwe qetiya; careke din firset nebû ku em vê pirsê qise bikin.

Piştî 12'ê İlonê dema ku min ji berpîsiyarek KIP'ê pirs kir, wan gotin, ku bîryareke me ya wisa tunebû. Xuya ye ku ew pêşniyara, Necmeddin ji ber xwe ve ji me re anîye. Helbet wisa ye an jî ne wisa ye, gerek berpîsiyarek KIP'ê yêne kevn diyar bikin. Lî tiştîn ku di rûpela 66'an de hatine nivîsandin, rayen berpîsiyarek KIP'ê rastir nîşan didin.

Necmeddin piştî ku ji partiya xwe qetiya, demeke dirêj derbas nebû, grûba me Rizgarî jî bû du bes. Wê deme di nav KIP'ê û PSK-T'ê de jî pirs û pirsgirêk çebûbûn. Di encama van pirs û pirsgirêkan de ji van partîyan jî cûdabûyîn hatibûn holê. Ew perçebûna tabiî, ji aliyen birûrayen merkezi ve bi şik, girêdayî merkezeke derva dihate dîtin. Ji bo vê, ci bi nivîskî û ci jî bi devkî gelek tişt hatin gotin.

Wek mînak hevalên ku em ji hevûdu qetiyabûn, di kovara Rizgarî de nivîsandin ku perçebûna Rizgarî bi plan û programa Celal Talebanî, bi wasita Necmeddin pêk hat. Lî dema ku mirov li rûpela 90'î bi-

nêre, gelek bi hêsanî dibîne ku ew rayen wê deme, ku ji aliyê Rizgarî ve hatibûn nivîsandin û ji aliyê kesen din ve bi devkî dihatin parastin, ne rast in.

Di rûpela 90'î de Necmeddin wisa dibêje: "Ez, ji aliyê me ev demek e ku dûr im. Loma di cûn û hatînê de ez li ser lingan, bûyer û guhartînê ku di nav hevalên te yêne grûba kevn de çêdîbin dibîhîzim û dibînim. Lî mixabin min îbo, îkram an ji Hatice nedît. Tirsa min ew e ku îbo û hevalên wî bikevin kemîna hevalên min yêne kevn. Çimkî ew hevalên min yêne kevn li dor îbo û hevalên wî diçûn û têne û nêzîkayî nîşan didin..." Gelek diyar e ku di perçebûna Rizgarî de ne bes roleke Necmeddin tuneye, tirsa Necmeddin heye ku em nêzîkî KIP'ê bibin.. Helbet wê deme rojnameya Aydinlikê jî nivîsand ku hêzeke xurt ya hevalbendê Sovyetê, girêdayî planen welatên sosyalist ava dibe. Ew hemû rayen ku wê deme dihatin pêşkêş kirin, "rayen pêşin" bûn, rastiya me û wan jî diyar nedîr.

Piştî perçebûna Rizgarî bi demekê, bi Necmeddin re pêwendiyen me pêk hatin. Di destpêkê de ez û Necmeddin, di Hezîrana 1979-an em cûn Başûrê Kurdistanê. Ew cûyina min û Necmeddin, di gelek şertîn dijwar de bû. Lewra wê deme, piştî bûyeren Maraşê, li Diyarbekirê û derûdora Diyarbekirê "îdara leşkerî" dihat meşandin. Li min jî dihat ge-

randin, ji bo vê yekê min xwe dabû aliyeke; rewşa Necmeddin jî her deme xeter bû û vê jî têrê nedîr; pêwîst bû ku em ji Diyarbekirê heta Kurdistanâ Iranê, grûbek çekdar û bi vê grûbê re jî gelek tiştan bibin. Di encama de em bi serketin. Wê deme li Iranê guhartîn çebibû, Kurdistanâ RojheLAT azad bibû û bi şîklikî ketibû destê hêzîn Kurdistanê.

Di encama van pêwendiyen de, di dawiya 1979'an de xebata me ya yekîtiyê dest pê kir. Lîbelê, ji bo ku Necmeddin zû de li welêt nedîma, me ji bo pirsên yekîtiyê îmkana munaqesen fireh û kûr nedîd. Dema ku me firset didit ku em li ser pirsan munaqese bikin, ji bona ku Necmeddin bûyer û pêşketinê ku li Kurdistanê dihatin qewimandin, nedîkarî taqîb bike; ji munaqesen siyasi û ideolojik dûr bû, ew di munaqesan de dibû sedema xetimandin. Necmeddin bi xwe jî ew rastiya qebul dikir. Necmeddin ev raya xwe di rûpela 95'an de jî nivîsandiye.

Dema ku me bi Necmeddin re pirsan yekîtiyê munaqese dikir, wî wek berpîsiyarek grûbekê hareket dikir. Bi rastî me ji dizanî ku Necmeddin girêdayî grûbekê ye. Hezar mixabin, Necmeddin tu caran di pirsan yekîtiyê de hevalen xwe yêne din ji me re nekir muxatab. Ew jî dibû sedem ku dema ku Necmeddin amade dibû, me dikarî kar û xebatên xwe bimesin. Ew astengiyeke gelek girîng bû. Xuya bû ku grûba wî, metodeke wisa diyar kiribû. Lî gelek caran, ci bi awaye fermî û ci jî bi awaye nefermî, me bala Necmeddin dikişand vê şâsiyê. Lewra ew metoda dibû sedema derengketina xebata me.

Ji derveyî vê jî, me bes ne bi Necmeddin re, bi grûba wî re yekîtiyê pêk dianî, ji bo vê yekîtiyê; hevûdu naskirina herdu grûban û bi hev re kar û xebatên rojane kirin jî girîng bû. Ew metoda hevalan firset nedîda van tiştan.

Di encama de, di havîna 1980'î de firseteke fireh ji bo me derket ku em pirsan xwe yêne yekîtiyê munaqese bikin. Di munaqesen yekîtiyê de, li ser navê Ala Rizgarî em du heval besdari civînan dibûn. Munaqesen me gelek dûr û dijî dom kirin. Dema ku ez li ser pirsan taybetî sekinim, ezê vê pirsan piçekî din vekim. Lî di encama munaqesan de em gihiştin bîryareke konkret. Gorâ wê bîryareke, Necmeddin biçuya bi ew grûbên ku ji bo yekîtiyê pêşniyar dikir re danûstandin bikira. Piştî ku wî ev danûstandin xwe zelai kirin, dê bihata bi me re pirsan yekîtiyê bigîhanda dawîye. Ji bo vê yekîtiyê wext jî hatibû diyarkirin.

Di tarîxa ku hatibû tespîtkirin de Necmeddin kar û xebatên xwe xelas nekir. Di wê nav-

berê de darbeya leşkerî ya 12'ê İlonê pêk hat. Necmeddin ji bo ku di wê yekîtiya ku difikiri de biser neket, sedemîn wî jî diyar nekirin; sedemîn nû nîşan dan û ew ji bû sedemî ku navbeyna me vebe, em ji hevûdu dûr bikevin. Ji bo ku ji sedemîn esli dûr bikevin, di nav Diyarbekirê de, him jî di şertîn 12'ê İlonê de (13 İlonê bû), bi du berpîsiyarek me re munaqeseke sert kîrin, ku hindik mabû şer derxin. Necmeddin di destpêkê de ew sedem bi yek rûpel û nîv nivîsara xwe de, Necmeddin gelek êrişen neheq û ne di cî de dianî ser Ala Rizgarî û beşek kadroyen wê. Li hemberî wê nivîsara Necmeddin, min, li ser navê Ala Rizgarî nivîsareke dûrûdirêj ji wî re birê kir. Ew herdu nivîsar jî di arşîva min de ne. Di pêşerojê de gava ku pêwist be, ezê herdu nivîsaran jî çap bikim.

Ew munaqese bûn sedem ku bi Necmeddin re peywendiyen me yêni siyasi, şexsî xirab bibin. Necmeddin ji bo kûrbûna wan nekokîyan hewlida. Di wê navberê de pirsan pirtûk û belgeyan ku li cem hevalê me Samî hatibûn parastin, Necmeddin kir pirsan girîng û girêdayî van pirsan êrişen xwe domandin; heta êrişen xwe bir dereca şer, ku li Şamî li qehwexanekê bi hevalêkî me re şer bike.

(Di hejmara 24 ya Yekîtiya Sosyalist de dema ku min li pirtûka Xorto rexne girt, di wan rexnan de ez li ser wan pirsan jî rawestiyabûm. Ji bo vê yekîtiyê jî ez naxwazim niha li ser wan pirsan hûn direjtir rawestim.)

Hezar mixabin ku ew pirsan ne gelek mezin, bûn sedem ku pêwendiyen me û Necmeddin xerab bibin. Piştî re Necmeddin ew dijîtiya xwe domand. Li ciyê ku min ew didit û silav lê dikir; wî gelek bi zorê bersîva silava min dida.

Ez û Necmeddin di gelek şertîn dijwar de bi hev re meşîyan. Necmeddin welatparêzekî gelek egît û fedekar bû. Dema ku mirov bi wî re dijiya, çavê wî tu carî ne li berîka mirov bû: Ji wî ci bihate, ew dianî cîh.

Ji tevgera Başûrê Kurdistanê re û bi taybetî jî ji YNK'ê re gelek alîkarî kiribû û dikir jî. Ji bo vê yekîtiyê, li pirsan tevgera Bakûrê Kurdistanê bi giştî bi çavê tevgera Başûrê Kurdistanê û bi taybetî jî bi nîrînên YNK'ê dinêre. Dema ku name û bîranîn wî, baş bîn lêkolîn û şirove kirin; ev rastiya gelek bi hêsanî tê dîtin. Ji bo vê yekîtiyê, wek merivekî ku wî ji nêzîk ve nas dike, ez dikarim bibêjim ku Necmeddin zêdetir kadroyekî Tevgera Başûrê Kurdistanê bû. Piştî şehîdbûna wî, baş tê bîra min ku rad-yoya YNK'ê û Celal Talabanî jî di gelek hevpeyvirîn xwe yêni şexsî de ew rastî gelek eşkere diyar kirin. Dûmahîk heye

Cirok

Çelek

■ Nizar Agiri

Êvari, berî ku roj here ava, roja Sêşemiyê, di dawiya meha Nisanê de ev bûyer li dar ket.

Dunya xweş bû, bayeki hênikî tije bîhna gul û pîncaran û şînkayiyek qeşeng hawîrdora qerexên çem dagirtibû. Xumxumeke sivik ji ava çem a ne kûr dihat.

Sino, kurê Ezizê Husêno, wek her roj li dora perçê zadê xwe li kîleka çem diçû û dihat, ew diparast. Şîva wî di dest de, çavên wî wek çavên pilingan bi diqet û bi bende-warî li hemû qorziyên zêd digeriyän. Wek pilingê ku li bende nêçira xwe be...

Aras, lawê Silêmanê Gurrî, çeleka (manga) xwe ya bi tenê li pê

- Ma qey ezê ji te bitirsim?

Sino nehişt ew gotina xwe temam bike, bi şîva di dest xwe de derbek xurt daweşand serê wî. Aras ket erdê û di nav xwînê de gevizi.

Kes nizane bê kî xeber gihan-dibû birê Aras yê mezin. Wek ku erd bigelişê û ew jê derkeve. Rahîstibû dareki dirêjî qalind. Bi hatina xwe re êrişî Sino kir û bi daran Sino li erdê veziland, ciho-kîn xwînê ji dev û lêv û rûyê wî diherikî.

Lê gund çawa bi bûyerê hesiya ev jî hin nayê zanîn. Ezizê Husêno bi lez ji malê derket, kulingê wî di dest de û ber bi qada şer çû. Jina wî Fatê, da pey, her du desten wê tijî



xwe radikişand. Hişk bi werisê di hustuyê wê de girtibû û bi hemû hêza xwe hewil dida ku çelek devê xwe navêje ji zadê xelkê de.

Aras û çeleka xwe nêziki zadê Ezizê Husêno bûn. Çelekê ji nişka ve xwe rakişand û devek avêt ji simbilan de.

Di wê deqiqê de çavê Sino li çelekê ket û simbilên delal yêni di devê wê de dit. Hiş û aqil di seri de nema, birûsk ji ber çavan cûn, rehîn cêniça wî li hev ketin. Kir qîrin û biley ber bi Aras baz da. Jê pîrsi:

- Ma gelo xelkê zadê xwe ji bo çeleka te çandiye?

Aras got:

- Malixerabo, baqek simbil ziyanê nagîhînê zêd û dunya xerab nabe.

Sino bîhn neda xwe û got:

- Heger çelek her rojê qevdeki bixwe wê rojek bê ku zad namîne.

Aras got:

- Law ez tu carî nahêlim çelek zêd bixwe û vê carê jî min bi hemû hêla xwe ew radikişand, lê nizanîm çawa bû firset ji min sitand û çend simbil rakirin.

Sino:

- Divê te çelek ji nêzî zêd derbas nekira.

Aras got:

- Ma jiyanâ we li ser wan çend simbilan maye?

Sino bi hêrs:

- Tu bi serde ji zimanê xwe dirêj diki?

Aras lê vegerand:

Şîv û dar bûn. Li pey wê jî, xesuya wê, diya Ezizê Husêno, bi pitpit û bi xeber û dijûnê nemayı ku ji mal-bata Silêmanê Gurrî re dida. Ta heşte bapîrê wan û ta roja qiyamete.

Lê zengilê xeterê li dergehê Silêmanê Guri jî xist, bi hawar û qîrinê hestiri hemû ji mal derketin, dest û lepêñ xwe vemaltin û riya meydana şer girtin. Di destê Silêman de mirdiyaqen xêni, li pey wî keça wî ya mezin, Nêrgize, piş re jina wî ya dest bi hevir û paxil vekiri û pêxwas ji hundur pengizi û dest bi Hawarê kir. Pirê jî derket, bi kulman bi singa xwe ket û lanet li dê û bav û bavpirê Ezizê Husêno anî.

Kelkîn gund bûn wek şirît û riya çem girtin. Gava roj çû ava şenîyen gund tev de li ber çem civiyabûn. Li qerexa zadê Ezizê Husêno ku şerê mezin di nav de li dar ketibû. Sino û Aras ji seri ta pê, di nav xwînê de mabûn û xelkê ew revandin nex-weşxanê.

Serê Ezizê Husêno hatibû şikandin, jina wî, Fatê qirika wê birin bûbû. Diya wî derbek ji newqa xwe xwaribû û di çem wer bûbû.

Silêmanê Gurrî ji pişta xwe birin bûbû. Jina wî bi destê xwe yê çepê girtibû da ku xwînê rawestîne. Diya wî kulmek ji zikê xwe xwaribû û her hawar bû, porê xwe dikîşand.

Çelek li kîleka çem mexel hatibû, têr genim xwaribû.

RONO Û SIRÛDÊN BÊRÎKIRINÊ

Roka ber êvarê

Ahmed Huseynî

Yara min... Li welatê we, dema ku roka ber êvarê bi dilzarî sîtava xwe ji ser keviya kîlan û ji ser kilsa xemgîn ya goristanê, dikişand. Dema ku taristanê perdeya xwe ya komirînî vedigirt ser kolanê narîn yêne xewna bapîr û dayikan. Velerzin û şevpest, keştiya qunaxê di derya evîna min de dinaliya. Em di hêlinâ xwe de bûn, bi niyaza tîrînê, me hogirî şîrikê simbilan dikirin, bi bazbend û nîşit û çavşînkan, li ser derazînkan berzûrî yezdanekî mehreban dibûn...

Roka ber êvarê tîrêjên xwe dide hev, mirî li çirêñ bêrîkirinê digerin, bîranîn gér dibin, sawîr û qmîş bi hev re destana sînoran duqurîfîn..

Em dûr in, her ku em navêne we dibêjin em dev li zimanê xwe dîkin. Her ku olana dilê we digihêje dergehan em bi saw û metîrsîyan têne ke-saxtin... Her ku barana serê payizê dihingive axa we, bîna hevdînê ji kezeba me derdiç, em diperpitin, em li darkokên zaroktiya xwe vedigerin, weki şagirtan, em ji nû ve, pênuşen lerzê tûj dîkin, em di xêzên mirinê de bê xal û bê bînok û nîşana pîrsê ne:

Terkîn eniya çolê, ew çola ku bi rûkenîyeke nehînî serhatiya liwanan dihûnand. Çola me ya ku zirzî û se-rişîya zarokan di aram û bêdengîya şevê de vedîart. Û pasvanê xewna te cansivik û pêjindar bû, roka te di

Ü roka ber êvarê xwe naspêre pencereya axînê
Xweşbin û dilrevîn hildiperikin nêrdewana vê birînê
Wek agir e, sot û gurr e xwe dadide berhilata vê evînê
Girî sar e, diherike, xwe davêje ta û bextê vê zemînê
Tim oxir e, reng nîfir e, dinuqute ji bijangên vê nalînê
Tim êvar e, zilîndar e, xwe bernade ji himbêza vê girînê

Li Tirkîyê Huviyeta Kurd

Nivîskar û İekolîner Rohat li Almanya û İswîçreyê du seminer dan û du civînên sohbetan de besdar bû. Rohat seminera pêşî di 17'ê Çileya Pêşî de li Zurîhê, seminera duduyan di 27'ê Sıbatê de li Münihê da. Ya Zurîhê ji alî Kultur-Zentrum Kurdistan, ya Münihê ji alî Kurdistan Informations Zentrum hat organizekirin. Di her du seminera de ji Rohat li ser pêşketîna Huviyeta (Identity) Kurd li Tirkîyê rawestiya. Di van salîn dawîn de Kurden Tirkîyê di warê xwenasi, xwekişkirin û hayxwe-hebûnê çawa tê zanîn, pey xwe ke-

tine, koka xwe digerin. Angorî zani-yariyên dîrokî û sosyolojîk, ev prosesa bi destxistîna huviyeta Kurdi fro di çi qonaxê da ye? Kurd bi ci objeyan xwe dîkin yek? Wek van pîrsan, bersîvîn gelek pîrsen mayîn ji, di van seminera de hatin zelalkirin. Di warê pêşhatin an ji pêşketîna huviyeta Kurd de rola dinamika bingehîn wek çanda netewî, di van seminera de bi dûr û dirêjî hate munâqşekirin.

Herwisa Rohat di 16.01.1993'an de li St. Gallen û di 28.02.1993'an de li Frankfurtê, di civînên sohbeti de ji besdar bû.

Agahdarî

Ji ber çewtîyeke teknîkî ya postê, Armanc (No:135) negîhiştiye destê hin aboneyen me. Ji ber vê kemasîya teknîkî em ji aboneyen xwe yên ku bê Armanc mane lêborînê dixwazin.

Armanc

Akîko, Japoniya ku di salekê de fêrî Kurdî bûye:

"Êsa Kurda neqlî dilê min jî bû"

■ Zinarê Xamo

Heta nuha min Tirk, Ereb, Asûrî, Ermenî, Alman û Swêdîyên ku bi Kurdî fêr bûbûn, dîtibûn, lê yeka Japonî, min nedîtbû. Lê tesadufen dunyayê pirr in, gava dem tê, meriv dibêje "hella hella, ev jî hebû ha!" Li buroya Armancê gava ez rastî Akîko ya Japonî hatim (25.11.92) û bi Kurdî silav li min vegerand ez şas mam, min di dilê xwe da got "hella hella Japon û Kurdi!?"

Akîko ji Şamê dihat, rêwiya Tokyoyê bû. Ji bo dîtina me, riya xwe bi Stockholmê xistibû. Û nuhâ jî li buroya Armancê mîvana me bû. Pişti sohbeteke kin min jê daxwaza hevpeyvînekê, rûniştinekê kir. Akîko keçikeke pirr mutewazî ye, dibêje "ez ne tiştekim ku hûn bi min re hevpeyvînekê bikin. Lê ez israr dikim. Li ser vê, ciwanikê daxwaza min bi kêfxweşî qebûl dike û êvarekê dibe mîvana min.

Akîko ji gelek alî ve keçikeke entresant e. Ew pişti tesadufekê biryara fêrbûna Erebî dide û fêr dibe. Lê di dema xwendinê de têkilîya wê bi Kurdan re çêdibe, îcar biryarê dide ku Kurdî jî fêr bibe û fêr dibe jî. Ji bo fêrbûnê diçe Parîsê û Şamê dersa Kurdî digre. Bi wê jî qîma xwe nayne, ji bo ku di nav millet de pirakîfê bike, diçe Diyarbekirê, li malen Kurdan dimîne, Kurdiya xwe bi pêş dixe. Û pişti xebateke, deh mehan tê nuxta ku kanibe bi hêsanî bersiva hemû pirsên min bide. Ez jê re dibêjim:

- Te ji tarîx û zimanê Erebî destpêkirîye. Tu, li Sûriyê mayî, te li wir ziman xwendîye. Û işev jî tu li mala Kurdekî, di nav Kurdan de rûniştîye, bi Kurdî dipeyive. Çawa bû tu hat vê nuxtê? Ev intrese, ev tesaduf çawa çêbû?

Li hember vê pirsa min di mîzice. Dibêje:

- Çirok pirr dirêj e. Min zimanê Erebî salekê xwend, pişti salekê ez çum mektebê, qismê tarîxê. Di vî besî de ji Qamîşloyê xwendevan pir bûn, hemû Kurd bûn. Muamela wan bi min re pirr baş bû. Ez çum malen wan, min urf û adetên wan ji nêz ve dîtin. Min dilê wan nas kir.


Gava meriv li Akîko guhdarî dike, meriv dibîne ku bi rastî jî çiroka wê ya fêrbûna Kurdî dirêj e. Di dema şerî Xelîcê de ew çûye Hesiçê, Qamîşloyê, bi rojan di nav millet de maye, tirs û heyecana ku wê Saddam êrîşê Kurdistana Sûriyê jî bike, bi çavêr serê xwe dîye. Xwestiye di dema şer de muşaheda pisikolojiya millet bike. Dibêje:

- Millet nîv bi tirs û nîv bi hêvî bû. Digotin pişti şer belkî Saddam here û Kurdistanê çê bibe.

Li gor wê her Kurdekî Kurdistana Sûriyê dixwest bi hawakî, alîkariya Kurden Iraçê bike.

- Hetta hin hevalen min ên xwendevan dixwestin herin şer. Wilo min û wan, me yek tiş hîs dikir. Yanî min jî 'eynî wek wan şûrek derbas kir. Ew êsa di dilê wande neqlî cem min jî bû. Pişti vê dan û standinê min xwest ez mesela Kurd bêtir nas bikim. Û ji bo vê jî Kurmancî lazim e.

Ü tişte lazim kiriye, çûye li Kurdistana Sûriyê û li Kurdistana



Akîko: "Min Kurd ji nêz ve nas kirin. Ew êsa di dilê wan de neqlî cem min jî bû." (Foto: Armanc)

Turkiyê bi mehan di nav millet da maye. Bi Kurdî peiyîye, guhdarî kiriye. Bala xwe daye ku ev jî têr nake, îcar lêxistiye çûye Parîsê, Enstitûya Kurdî, li wir ji Kurdeki Sûriyê dersa Kurdî girtîye.

- Par ez vegeriyam Japonyayê. Min proja xwe çêkir. Min di xwest ez Kurmancî fêr bibim. Lê çawa? Hat bîra min li Parîsê Enstitûya Kurdî heye. Min got ezê biçme ba wan. Û ez çum Parîsê, Enstitûya Kurdî. Min di xwest ez mamostayekî bi İngilîz-Kurdî ya jî Kurdî-Erebî zanibe bibînim. Mamostekî ji Kurden Iranê ji min re got: "Yek ji Sûriyê heye", kîfa min hat. Ew, Kurdeki ji Qamîşloyê bû. Kurmancî baş zanibû. Ez çendekî mam. Di vê demê de ji sibê heta êvarê ez wer li ba wî bûm. Min pirr feyde jê girt.

Ji ber rewşa abori nikanibûye pirr bimîne. Vedigere Şamê. Pişti xwendina Parîsê biryarê dide ku di nav millet de bimîne. Li Şamê pişti mehekê du mehan dostekî; Dilawer Zengî nas dike. Sê mehan jî li ba Dilawer giramera Kurdî dixwîne. Lê ji tempoya fêrbûna xwe ne razî ye. Dibêje:

- Pirakîk tunebû ez her bi Erebî dipeyivîm. Ez pirr aciz bûm. Min biryar da ez herim Tirkîyê. Çimkî li wir kes bi Erebî nizane. Û ez çum.

Caxa Akîko bi telefuzeke Japonî hêdî hêdî van tiştan ji min re dibêje, li ser navê wan kesen ku "gotinê pirr mezin" dike, lê bi zimanê xwe napecivin yan jî hewl nadin ku fêr bibin, ez fedî dikim, li ber xwe dikevîm.

Belê, Akîko carê gotiye "ezê fêr bibim" û wê fêr bibe jî. Ew di havîna 1992'an de dihere Kurdistane. Li Diyarbekirê li dor mehekê li mala Kurdperwerekî dimîne. (Ez navê xwedîyê malê jê dipirsim, nabêje). Di vê demê de xwe bi pêş dixe.

Ez entresa wê ya li hember tarîx û zimanê Erebî jî meraq dikim. Dibêjim çima Erebî, çima tarixa Erebî.

- Çiroka vê jî berî deh salan dest pê dike. Li Tokyoyê, li Unîversitê di sinifa yekê da bûm. Maddeyek li ser tarixa İslâmî hebû. Di sinifê de xwendevanekî Suûdî hebû. Ji dêlî mamoste ve, wî sûreke Qur'anê pêşkêşî me kir. Ew cara ewil bû ku min ayetek ji Quranê dibihîst; bi zimanê Erebî.

■ Zinarê Xamo

Weşanên Nuh

Amadekar: Rohat

Mehrdad R. Izady, *A Concise Handbook-The Kurds* (Destpîrtûke Muhtasar-Kurd, Weşanxana Crane Russak, I-XIII+268 rûpel, Washington, 1992).

Di nav rûpelên vê pirtûkê de zanîyari û agahdarîyên li ser Kurdan bi tehrekî kurt cîh girtine. Pirtûk wek xebateke referansî hatîye amadekirin û ji deh beşan pêk hatîye. Di dawîya her besê de, angorî naveroka beşê, pirtûknasîkê jî cîh girtîye, bi vî tehrî xwendevan li ser çavkanî û materyalîn mayîn jî agahdar dibin. Amadakarî vê xabatê Mehrdad R. Izady hevkarekî Unîversita Harvardê ye (Beşê Ziman û Medenîyetê Rohilata Nêzik).



MEHRDAD R. IZADY

Rosmarie Thüminger, *Fidan-Langer Weg in eine neue Zukunft* (Fidan-Di Peşerojeke Nûh de Rêya Dirêj) Weşanxana Herder, 128 rûpel, Wien, 1992.

Ev romana ji bo ciwananî hatîye nivîsin. Di nav rûpelên romanê de Serbioriya Malbateke Kurd cîh girtîye. Ev malbatâ Kurd li Avusturyê dimîne, malbat paşê dixaze vegere Tirkîyê. Fidan navê keçikeke vê malbatâ Kurd e, donzde salî ye. Xuşkeke wê jî heye, navê wê Zozan e. Zozan rastî xorkeki Awustrî tê.

Ev yeka, lingê vê malbatâ Kurd dixe soleke teng. Roman, li ser bingehê dubendiyê çandî (kulturi) hatîye avakirin.



Sengül Şenol, *Kurden in Deutschland* (Kurd li Almanyê), Weşanxana Haag-Herchen, 242 rûpel, Frankfurt, 1992.

Ev pirtûk li ser rewşa Kurden ku li Almanyê dimînin, hatîye nivîsin û ji pênc beşen bingehîn pêk tê: 1) Kurd û Kürdistan, 2) Sî Saliya koçkirina Kurdan li Almanyê 3) Dubendîyen Huviyete yên Dema Koçkirinê û Kurd 4) Di Xebatê Sosyalî de Kurd 5) Rêxistinê Kurdan yên Xwealîkar Li Almanyê. Sengül Şenol ji sala 1980'e virda li Almanyê dimîne, beşa Sosyal-Pedagoji xwendîye, wek rojnamevan kar dike. Pêşgotina pirtûkê ji aliyê Jürgen Trittin de hatîye nivîsin (Wezirî navça Niedersachsen)



Nuh Ates, *İç Anadolu Kürtleri* (Kurdîn Anadoliya Navîn), Weşanxana KOMKAR, 141 rûpel, Köln, 1992.

Îro li dorberê bajarê Konya, Ankara, Kirkşehrî bi sed hezaran Kurd dijin. Ji ber ci sedeman û di kijan salan de Kurdan koç kirine van navçen Anadolîyê. Nivîskar, di vê pirtûka xwe ya nûh de dixwaze, bersîva van pirsan derxe ronahîyê. Ji aliyê din, rewşa wan, belavbûna wan, çand, urf-edetên wan û gelel agahdarîyên etnografîk li ser van Kurdan tê pêşkêşirin.

Nuh Ates


İÇ ANADOLU KÜRTLƏRİ

Konya - Ankara - Kirkşehrî

HELBESTA HEVÇERX YA KURDİ

BERGÉ 1

AMADEKIRIN Ü NIVISINA
KELİL DUHOKI



Di nav rûpelên vê berevokê de 16 helbestvanen Kurden Iraqê yên ku bi zaravê Kurmancî dinîvisin, cîh girtine. Di destpêka her besê de agahdarîyên kurt li ser jîyîna helbestvanan tê dayîn, piştre wek nimûne çend helbestvanen her helbestvanekî tê pêşkêşirin. Di dawîya vê cilda yekemîn de ferhengokeye ku ji pêyvîn ne-nas pêkhaşî jî, cîh girtîye.

□

DOSTÊ MINO ERCÎYAYE OSMAN AYTAR

Haydar DILJEN

"Doza (de'wa) mi a ya ki şaro Kurd zî zey şarandê azadan ê bînanê dinya, heme heqanê xo bigiro. Ez ze şexs na baweriya xo rê wayir (wahêr) vejiyêna û ez do wayir vejiya zî. Qandê coy ez ameya Tirkiya di bimana ki na ray di xebata xo bidomna".

Osman Aytarî, wexto ki serra 1990 di İstenbul di tepêsiya nê qisayê corêni işkence di polisan rê vaş. Nê qisan ser ra nezdiyê hîrê serrî ravêrdi, Osman 22'ye mengda jewini (yewini) di qandê nuşteyêndê (yaziyêndê) xo fina tepêsiya û kewt hepisxane. Oy o hepisxane ra zî Medya Güneşi rênuseno. Nuşteyê xo yê amora (hûmara) 23. a Medya Güneşi di kolonyalistan rê meydan waneno û wina vano:

"Ki şima mehfezekerdidî ideojîda resmî di israr bikerê û şima hewna bi reçetandê nijadperestey û şoveniyan a bi meselada Kurdan a aleqedar bê, qet qanûn û qerarnameyê şima yê nijadperesti, şoveni û anti demokratikî, ki ze şemşerî Demoklesi ma ser ra hîl benê, nêşenê vernî ifadekerdena raştey a ma ra bigirê."

Dostê mino erciyaye Osman Aytar, serra 1960'ı di Sêwregi di marda xo ra biyo. Mektebda dest-pakerdişi (ilkokul) di, mektebda miyanî (ortaokul) û lise di televêdö jêhaş bî. 1980 di Diyarbekir di kewt Fakulta Tibbi. O zî zey xeylê xortanê Kurdan lise ra tepiya bi meselandê welat û mileta xo ya aleqedar bî. Wexto ki Unîversiteya Diyarbekirî di wendê zî ze xortêdê welatperwerî xortanê Demokratanê Şoreşgeran miyan di cayê xo girot. Cüntaya 1980 dim a o zî mecbûr mend ki wendena xo ca verdo û welat ra bivîjiyo.

Osman, çend serrî tebera mend. Qiseyê ci yê ki mi seredê nê nuşti di nuşti, ci rê bî ze qanûn. O qandê resayışê hedefe xo şew û roj girweya, coxrafayêda hera di hereket kerd, bi seyan a meqaley nuştu.

Jû-jû fini şî welat û ame teber. Meseleyê welatî her sewiye di bi Kurdan a munâqeşe kerdî.

Ey weş qene'at ard ki şarê Kurdistanî do esas bi xebata zeredê welatî ya bireso azadey û xwiseraya xo. Qandê coy o 1990 di fini şî welat.

Goreyê belgeyanê ki dosyada ci di yê, 4'ê mengda Gulana 1990 ra heta 23'ye Hezîrani ajananê Tirkiya İstenbul di her roj o taqîb kerdî. O 23'ye Hezîrana 1990 di İstenbul di tepêsiya, 17 rojî İstenbul di pa işkence kerdî. Dima 9'ê Temmûzi di o berd Diyarbekir. Heta 15'ê a mengi zî işkencexanandê Diyarbekirî di ci rî işkence kerdî. Osmanî hîrê heftey pêser o işkence di labirê vera polisandê Tirkân zey camêrdan a xo ver ro da û heme dek û dibareyê eynan pûç vetî. 15'ê Temmûzi di o berd mehkema û tewqîf kerd. Osmanî zeredê hepisxanî di zî xebata xo sist nêkerdi. Wexto ki Hepisxaneyê Diyar-

bekirî yo namedar di bi, 28.8. 1990 di Amnesty rî, 16.9.1990 di zî işkenceyanê ki Kurdistan di benê ser o Komîteyê Vernîgirotişê Mehmeleyê Xirabî rî raporêda dergi nuşti. Nê raporan di va "Seraserê Kurdistani biyo cayê tehdâ û işkenci. İşkence Tirkiya di biyo politika dewleti û awayêdo bi sistem a dewam keno."


Hepisxaneyê Diyarbekirî ra veradeya tepiya, bi namedê "Talihê Makus" ê Kurdi û Projeyê "Rojhelatêbaşûri"-Proble-mî û Rastî (Kürdün "Maküs Talih'i ve "Güneydoğu" Anadolu Projesi-Sorunlar ve Gerçekler) û Alayîyanê Hamidiyyeyan ra Heta Pawitoxanê Dewan (Hamidiye Alayalarından Köy Koruculuğuna) di kitabî nuşti. Kitabanê ey şari miyan di weş alaşe di.

Amora Medya Güneşi ya 16. ya tepiya Osman bî Mesûlê Umûmî yê Neşriyatî yê na kovari (dergi). Amora 16. ra tepiya heme sernuşteyê Medya Güneşi ey nuşti. Hetta be'dê tewqîfbiyayina xo zî nuşteni ra fek vera nêda, hepisxane di zî nuşteyê xo nuşti û resnay Medya Güneşi. Osman, heme nuşteyanê xo di zî problema Kurd û Kurdistani ser o vindeno û raya helkerdişê mesela Kurdan misneno (nawneno).

Osman, serranê ki Awrûpa û çayandê bînan di mend, zey tanîni (tayîni) wextê xo bi çiyandê ven-gan a nêraviyarna. Ey him kitabı nuşti him zî tanî (tayn) kovar û gazeteyan rî bi seyan a maqaley û nuşteyê bînî nuşti. Ziwan misa (bander bi). Berey dest bi nuştişê Kurmançî û Dimîlkî kerd, labirê rew misa. Nika nuştişê Kurmançî û Dimîlkî yê ci, ê zaf nuştoxan ra weşer o. Na mesela di zî ganî (gerek) zaf Kurdi Osmanî ra ders bigirê.

Qerardarbiyayış û fedakareya Osmanî, ci rî zaf dosî zî dişmenî zî peyda kerdî. Bêguman dişmenyea kesan û dezgeyan ê ki menfe'etê eynan işxalkerdeşî welatî ma û lingan bin di verdayışe mîleta ma di esto, bêminet a.

Ez jû-jû fini fikiriyêna, Osman Aytarî zî zey ma bi seyan a kesanê bînan şayê xo rî Awrûpa mesken kero, xo rî karê bivîno yan zî mucadele ra fek verrâ do. Labirê ey rayênda riskine û fedakarey nê xo ver, macîranê siyasiyan rî bî nimûneyêndê veraci-man û erciyaye. Heta nika, bêxeyja (bêxeyra) Osmanî û M. Ci-branî, kadroyanê Kurdanê Tirkiya



Osman Aytar (Foto: Armanc)

ra, ci siyasetan û ci zî kesandê xoseran ra -jew didi netêda- o se-wiye di ci kesî rayêda wina nêne xo ver. Beno ki partîyê ra, grûbê ra çend kesî yan zî çend kesê "xwiser" i qandê gerillayey yan zî xebata siyasi akeyrayê welat, labirê amora kesandê siyasiyan ê mesûlan ê winasinan (enasarînan) zaf tayn a.

Co ra Osman maciranê siyasiyan ê peydê cuntaya 1980 miyan di wayirê 'edetêndê newî û rûmetinî yo. Baweriya mi bi xo a ya ki rolê kesandê winasinan xebata û lebata siyasi di gird o. Merdimê wina fedakarı, qerardarî û wayirê mesûliyetey çend vêşî bê, do reyayışê welatî û şarê ma hendi rew bo.

Osman nuşteyê xo yê amora peyên a Medya Güneşi di wina vano:

"Eke ma bi mesûleteyê tarîxi ya meselan ra nêwiniyê, sebebanê vinikerdiş û pedeşiyayışe sereh-wadayinan û xoverrodayinanê Kurdistani ra dersan nêgirê, bi qerardarey a mudaxeleyê meselan nêkerê, vinikerdiş û pedeşiyayış heme gami şeno ma sere di bero. No vinikerdiş û pedeşiyayış do ê ma hemini bo."

Ma îcab keno ki kes qiseyêna nê qiseyandê Osmanî ser kero? Nê qisey ıspat kenê ki mesûliyeteyêda girdi û xorfini rih-dê Osmanî di halê viraşto. Kurde zey Osmanî garantiya rojê meştin ê welatê ma yê. Kurde ki no der-ece di fedakarey kenê çend zafî bê, reyayışê welatê ma do hendi nezdî bo. Keso/Kesa ki xo welatperwe-reðo/welatperwerîda Kurd zano/zana, fîkrê ci içi beno wa bîbo, ci rî zanayışê qedre kesandê wi-nasinan a tepiya çiyê nêkewno.

Wexto ki mi no yazi nuşt mehkemaya Osmanî rî di heftey mendi. Ez hêvi kena ki Osman serbest veradiyo. Çiki ewro, kao-sê Kurdistanî di zaf ihtiyacê Kurdan bi kesanê zey Osmanî ya esto.

Kongreya Federasyonî Swêd di

Kongreya 13. a FKKS rojandê 27 û 28'ê Sibati di Stockholm di Medborgarhuset di viraziyat. Kongre di 43 komeleyan (dernegan) ra 144 delegey hazir bîy. Na kongre di destûrname (tütük) di xeylê virnayîn (bediliyayışı) bîy. Endamê komîta karger a Yewîya Ce-niyan (Yekîtiya Jinan) û Xortan bî delegey tebiî yê kongre. Kongre do di serran di finê kom bîbo. Labelê nabeynê di kongreyan di do konferansê bîbo. Ancî komîteyê rayber (îdarekerdox) ê Yewîya Ce-niyan û Xortan ra kesê do bîbo endamê komîteyê rayber ê Federas-yoni.

Mûyênda Sipî

QEDRİCAN

Ewro, şewra ez lîlikî ver ra râvîrde. Mi pardê seredê xwi miyan di müyênda sipî dî... Zey birûsikê (virski, virsoyê) şewa tarî cirûsiyayê (beriqiyayê).

Gama ki çimê mi pa kewt, ez veciniqiyaya; zeki nişkê ra şimşêre seredê mi ro gino. Zeki jew (yew) azmîn ra bêro war, beyraqênda sipî ci dest di bo û mijdiyana (mizgîna) mergî bido mi. Mi fahm kerd ki derdêndô bê derman o, yan jî lay kefenî ra viyayêن a...

Ey mûya sipî! Mi caran renga sipî zey gewreya to siyay, û roşni hendê roşneyda to tarî nêdî. To heme çiyo sipe çimandê mi ver o siya kerd, heta roşneya aşm û rojî, heta roşna her di çiman. Ü to heme çiyo siya jî çimandê mi ver o sipe kerd, heta qijika siyay, heta bext û zerrîya siyay.

Ey mûya sipî! To xwi kamcîn pencera ra eşt seredê min ser û to kamcîn ray ra xwi resna cêngîda (cînegda) mi?! Ti senî şena nê hîgayê tarî di tik û tenya, bê embaz û birak bimana? Qet çimê to nê tarîyê siyay ra nêterseno?!

Ey mûya sipî! Ez nêzana ez xwi senî to ra bixelisna û senî to ra birema!

Qet faydeyê ci mi rî çinîyo ki ez to cadê to ra bianca yan jî to boyax kera. Ez nêwazena ki miyanê di müsîbetan di bimana: Musîbeta zûran û müsîbeta pîrbiyayını...

Ey mûya sipî! Ez vînena ki ti wayira dek û rîpan a, ti hêdîkî

goşdê embiryandê xwi di kena piçip, ti ïnan xapênenâ ki ê jî zey to bibê û cilê (çinayê) ki to xwi ra dayê, ê jî xwi ra dê. Ti wazena miyanê nê diyarê bêveng û bêteşqeli di ceng û cîdalê viraza ki herkes binê lingan di paçol bo. Ti ze însanênda sipî kewna welat-dê siyayan û ïnan xapênenâ û ti ê belingazan xwi rî kena kole û hêsrî.

Ey mûya sipî! Ti kam a, kamî ti rişa (erşawita) û karê to mi het di ci yo? Eke ti mêmân a kanî ïzn û destûra ki mi daya to? Eke ti bi embazey a ameya mi het, ez a embaza ki mi bi xwi ya bero gorr nêwazena. Homay zano ti zey ê maran a ki hîlinê her tebay qula xwi zanê.

Ey mûya sipî! Min xeylê gerre û gazî to ra kerdî, labelê ez vînena ki ez raşt niya, fina ti her çî ra, her kesî ra vêşer mi het di rûmetin, çimandê mi ver o qedrin manena. Wa serê mi to rî zozan û pîroz (bimbarek) bo. Ti xwi rî -zeki ti wazena-te de bigevizi.

Ez zana ti raybera mergî ya, raybera a ray a ki qet çare ci rî çinîyo. Ci rî ez riyê xwi tîrş kera? Mi xortaneyda xwi ra qet xeyr nêdî ki ez pîrbiyayında xwi ra bitersa. Mi şîrineya dinya ta'm nêkerdi ki talbiyayina axretî ma'de mi tîrş biko.

Wey ti serî û çiman ser ameya ey mûya sipî!..

*Kurmanckî ra tadayox:
N. ELİ*

Celal Talebanî Şî Şam

Kombiyayısdê wezîranê karanê teverî yê Tirkiya, Îran û Sûriye ki 8'ê mengda Sibati di Şam di bi tepiya, serokê Yekîtiyî Niştimanî Kurdistanî Celal Talebanî Şî Şam, ardimciyê Hafiz Esadî Abdulhalîm Xad-damî ya roniş û halê Kurdistanê İraqî ser o ci di qisey kerd.

Heyetê PKŞ Kurdistanê İraqî di

Dawetkerdena Parlamentoye Kurdistanî İraqî ser o, Partiya Ked a Şâfi (Halkın Emek Partisi) ra heyetê şî Kurdistanî İraqî. Heyet nabeynê 3 û 11'ê Sibati di Kurdistanî İraqî di geyra û bi mesûlan a qisey kerd. Heyetê PKŞ di Serok Ahmet Türk, mebûsan ra Zubeyir Aydar, Mahmut Kîlîç, Ali Yiğit, Mehmet Sîncar, Serokê Partiya Azadî û Demokrasi (Özgûrlük ve Demokrasi Partisi) Mewlûd İlîk, Sekreterê PKŞ Ahmet Karataş û reisê belediyeye Diyarbekirî yo kehan Mehdi Zana estbi.

Bi lehçeya Dimîlkî (Kirdkî) kitabêdo newe:

Siyamed û Xec a,
255 riperti,
arêkerdox:
Koyo Berz

Adresa waşteni:
APEC Tryck-Förlag
Box 3318
163 03 Spånga
Sweden



Keçeye Kurd xelata pirtûkxana Uppsalayê girt

Li Swêdê keçeye
Kurd ya 14 salî, Şilanê,
li ser rewşa Kur-
distanê çirokek nivisi
û xelat girt. Çiroka
Şilanê wê li Swêdê
wek kitêba dersê ji çap
bibe.

Kitêbxaneya Uppsalayê di nav penaberan de musabeqeeye çiroka çêkir. Babêtê musabeqeeye "Li Upplandê penaberbûyin çawa ye" bû. Ji bo vê musabeqeeye 64 berhem hatin şandin. Ji van 8 berhem layiqî xelatê hatin dîtin. Ji van xelat 5 heb ji nivîskarên salmezin û 3 heb ji yên zarok re hatin belavkirin. Ji van nivîskarê zarok, yek Şilan û yên din ji yek keçeye Yogoslawî Vanya Svatîc û yek ji keçeye Alبانî (Arnawitî) Safete Beqiri bû.

Şilanê di çiroka xwe de rewşa Kurdistanê, ji Kurdistanê koçkirina Swêdê, şeva derbazbûyina binxetê û jiyanâ xwe ya li Swêdê anyezimên.


Pirtûkxana Uppsalayê, di 6'ê Sıbatê de bi merasmekê xelat belavkirin. Radoya Upplandayê, Beşâ

Hîndekariyê û Rojnameya UNT bi Şilanê din re hevpeyvin kirin.

8 berhemê ku xelat girtine, wê wek pirtûk ji aliye pirtûkxanê ve bêncapkirin.

Kitêba dersê
Şilanê li ser vê musabeqeeye dîtinê xwe ji Armancê re weha diyar kirin.

Ez bi qezencikirina vê xelatê pir këf-xwes im. Ez fitbolê ji dilizim. Min heta niha di fitbolê de gelek xelat girtine, lê di warê nivîsîne de ev cara yekem e ku ez besdarf tiştekî weha dibim û xelatê qezenc dikim. Li gor şertê pirtûkxanê mirov dikaribû pirtir bi 2 rûpel nivîs besdarf musabeqeeye bibûya. Ji ber vê yekê ez bi beşeke ji çiroka xwe besdarf musabeqe bûm. Temamê nivisa min pir direj e. Ewê, bi Swêdî, wek



Şilan Ottu


kitêba dersa xwendinê bêçapkirin û di dibistanen Swêdê de bê xwendin. Mamosteyeke Swêdî ji ji kitêba min re bi temrinê gramera Swêdî pirtûkeke xebatê amade dike.

Şilan 14 salî ye û diçe sinifa 8'an. Bi Kurdi, Swêdî, İngilizî, Almanî û Tirkî dizane.

□

Xaçepîrs

Amadekar: S. Rêving



ÇEPERAST

1-a- Li Kurdistanâ Sûriyê navê bajarekî bnavê rojekê c- navê cihekî ji laşê mirov. 2-a- di Kurmancî de pronavek b- bayê xurt, yê ku babilisokan radike. c- roja berî do. 3-a- kurtiya peyva Doktor b- navê kulişkê 4-a- edalet b- heywanê mirî yê ku goşte wî nayê xwarin. 5-a- karê ku rezvan dike. b- ne germ (berevajî) 6-a- pronavek (berevajî) b- navê gulekê 7-a-fékiyek b- di serê cumlêna pirsê de tê gotin. 8-a- Na, no, (berevajî) b- Li Kurdistâ

na başûr navê bajarekî. 9-a- heywana ducan, "hemîl" b- Navê Şêxê Yezidiyan ku ziyaretgeha wî li Kurdistanâ başûr, li çiyayê Laleş e. 10-a- Naznavekî Celadet Bedirxan, her weha li Kurdistanâ bakur navê çiyayekî ye. b- Navekî din ê Diyarbekirê 11-a- Navê Hewwa yê bi latînî b- Ji çar xelîfeyen İslâmî yek e. 12-a- Dîrokna dibêjin ku ew bavkalen Kurdistan in. b- rih, riş c- ji çengela bi şewka masiyan ve ye tê gotin, yan derziya bi çengel ya ku jin pê neqîsa çedîkin.

1	MAHABAD	CETO
2	EYAN	SENEGAL
3	ME	XAVIKLO
4	ÜPEK	ZOF
5	ZYAR	NAMYEP
6	TSAL	BIRAVA
7	NAP	KEMMEL
8	SBERO	OMEN
9	NOBEL	NASSE
10	EN	EMTOT
11	R	TREM AEEZ
12	TKRT	UD ART

Li Sûriyê welatparêzê Kurd..

nayen qeydkirin.

Di belavokê de Serokatiya Hevpar ya her sê hêzan weha dibêje;

"Berdewamiya rejîma Sûriyê li ser polîsi-kaya jî-martina sala 1962'an û bi deh hezaran Kurd ji mafê hemwelatiyê bêpar hiştin, perçeyek e ji polîsi-kaya tuxumperest ya ku Sûriye li diji Kurdish dimeşîne.

Geli kesen xwedî wicdan li seranseri Sûriyê!

Xuş û birayen we yên Kurd di bin zordariya vê polîsi-kaya şovenî ya Sûriyê de, dinalin. Ev polîsi-kaya zearê dide her kesê ku li Sûriyê diji û dibe sedemê nexweşî, newekhevî û ji-hevketina civakî, siyasi û di nav xelkê Sûriyê de dijayetiye peyda dike.

Geli kesen welatparêz!

Geli kes û rôxistinê ku ji bo mafêni mirovan kar din!

Em gazî we dikin û hêvidar in ku hûn piştgiriya milete Kurd bikin ku ji vê zordariyê, bêmafîyê xelas bibe.

Biji xebata ji bo demokrasî, wekhevî û mafêni mirovan!"

Ji bilî bûyerên li jor, li

Kurdistanâ Sûriyê cardin galgalen li ser rakirina Kurdishan û anîna Ereban bo Kurdistanê, tê kirin. Tê gotin ku hukûmeta Sûriyê vê carê dixwaze erdê Kurdish ji wan bigre û bide Elewiyan û Elewiyan bîne li Kurdistanê bi cih bike. Wek tê zanîn, di sala 1973'an de bi navê bûyerâ "Hîzam el-Erebî" hukûmetê erdê Kurdish dabû Ereban û Ereb hatibûn li gundêne Kurdish bi cih bûbûn.

Kesen hatine girtin piraniya wan ji Qamîlo û Dirbêsiyê ne. Ew kes ev in;

1- Ebdulbaqî Salih (Muhindis) ji Qamîlo, 2- Musa Husên ji Dirbêsiyê, 3- Şerif Şukrî Şukrî (karker) ji Dirbêsiyê, 4- Umer Elî (karker) ji Dirbêsiyê, 5- Hesen Qaso Xelef (xwendevan) ji Dirbêsiyê, 6- Mihemed Sedîq Ehmed (Mamoste) ji Dirbêsiyê, 7- Mihemed Salih Hemê Kamîl (xendevan) ji gundê Tildîkê, 8- Elî Heso Osman (karker) ji Serê Kaniyî, 9- Bedir Xelîl Dawid (karker) ji gundê Tilhermil, 10- Şerif Ebû Zeyd Osê (karker)

ji Qamîlo, 11- Ehmed

Ibrahim Mihemed (karker) ji gundê Qoşa, 12- Mihemed Yûsif Hesen (karker) ji Qamîlo, 13- Zekî Hecî Mihemed (karker) ji Girkundê, 14- Mehmûd Cemîl Ebdulhelîm (Avûkat) ji Qamîlo, 15- Mehmûd Mihemed Emo (Mamoste) ji Qamîlo, 16- Elî Ebdulhelîm Cemîl (karker) ji Qamîlo, 17- Şêxmûs Şêxmûs Ebdulqadir ji Dirbêsiyê, 18- Silêman Şêxmûs Mihemed (karker) ji Dirbêsiyê, 19- Ebdulqâhar Dawid (mamoste) ji Dirbêsiyê, 20- Mihemed Seîd (karker) ji Qamîlo, 21- Mesûm Şukdî (karker) ji Qamîlo, 22- Beşîr Mihemed Şêxmûs (Mamoste) ji Hesiça, 23- Dara Heso Naîf (mihendis) ji Hesiça, 24- Yûnis Hesen Hemê (karker) ji Qamîlo, 25- Welîd Husên Ebdulqadir (Mamoste) ji Qamîlo, 26- Mehmûd Beşîr Mele Ehmed (Mihendis) ji Amûdê, 27- Selman Oso Ebdulmecîd (Mihendis) ji Dirbêsiyê, 28- Ebdulxenî Elî Mihemed (karker) ji Qamîloyê, 29- Ebdulbaqî Senan (mamoste)

"Em mecbûr in ku vê felaketê..."

alî û warî de dimeşîne û "şerekî tevayî" li hember gelê Kurd dajo. Qala terora bêhudûd, girtin, şewitandin û wêrankirina gund û bajaran dike û weha dibêje:

"Wek ev hemû ji bes na-kin ji 2 salan û vir de hêzen tarî ku baweriyen olî yên gelê me istîmar dikan, ki-riñ belayê serê gelê me. Ev çeteyen ku ji aliye dewletê ve tên xwedîkirin û para-stin, her roj bi dehan însanîn me yên rewşenbir û welatparêz li orta caddeyan dikujin û bi vê terorê dix-wazin gelê me çavtîsandî bikin. Ev hukûmeta ku bi durûtiya "demokratîk" yê hate ser hukum, nahêle di serî de çapemeniya Kurdi û hemû çapemeniya pêşverû, welatparêz û sosyalist bêne belavkirin û rojnamevanan

dikuje. Rejîm tovîn dijmi-nîye di nav gelê Kurd û Türk de direşine û dixwaze kedkarên Türk bikese avzela şovenîzmê. Dijmin dixwaze me li welatê me bixeniqnê. Ji ber vî şerê qirêj welatê me wêran dibe, însanîn me li ber çavên me tênu kuştin. Gelê Kurd iro di şerê hebûn û nebûn de ye".

Piştî belavok qala teror û wehşeta Türkîye dike, bangî gelê Kurd dike:

"Birano! beriya ku em bigîhîjin wê nuxtê ku em nikaribin şünde vegeerin, em mecbûr in ku vê felaketê bidin sekinandin. Li hember êrişen dijmin yên tevayî; ci jin, ci mîr, ci xort, ci pîr, ci gundî û ci bajarî, ji bilî seferberbûna me wek netewe tu çare tuneye."

Bav û keçik...

Xwestin keçikê tazi bikin, lê keçik û bavê wê bi hemû hêza xwe li ber xwe dan. Lê leşkeran Seydo û keça wî li dûv panzerê girêdan û heta ruh ji wan çû bi erdê re kişandin.

Lê dema nûçeya vê bûyerê

di televizyonê de dan, gotin: "yek jê keçik, 9 terorist hatin kuştin".

Piştî ji xîşir û tişten bi qîmet yên gundiyan talan kirin, xaniyên wan şewitandin, xera kirin û geleb girtin. Ji gun-

"Em bangî hemû kes, dezge û rôxistinê me di-kin: Yan emê hêzen xwe bikin yek û dijminê xwe ruswa bikin, yan jî emê lekeyek binketinê ya nû bi eniya xwe din. Em wext wenda nekin, riya sisîyan tuneye. **Ji bo ku yekîtiyên herêmî bîbin yekîtiyên netewî, berpîrsî ya her kesî ye.**

Berxwedana gelê ku hêza xwe kiriye yek ji aliye tu zalimî ve nikare bê şikandin. Ku em bi vê zanebûnê kar nekin, sibê di-ke re dereng be.

Geli hêzen welatparêz, demokrat û sosyalist li hember dijminê müsterek em yek bin!"

Em bi hev re bijîn

serbixe ya Kurdi heye. Dema doza hin mafêni hûr û piçük tê kirin, endîşa damezrandina dewleta Kurd çedîbe. Ji bo mirov azad be, ne pêwist e ku serbixe be. Dema ku ji imkaniyaten dewleteke mezîn feydedîtin hebe, cîma însan xwe mahdut bikin".

Di civînê de hin ji teblîxen hatin dayin hin ev in; Prof. Bulent Tanor "Li gor qanûna esasi û huquqa hundurin pîrsa Kurd", Turgut Tarhanli: "Li gor mafê mirov û huquqa nav-

jîyanê de, li ser esaseki maf-darı ê wekhev rûne. Pîrsa Kurd, bi diyalog û bi riyan astî û demokratîk, lê li ser esaseki wekhevî dikare hel bibe.

Prof. Mete Tuncay ji got ku pîrsa Kurd di nav federas-yonê de dikare hel bibe. Umit Fîrat armancâ sempezyumê weha şirove kir: "Bi taybetî me di vê sempozymê de, dema her du civat bi hev re bijîn, wê bîbin xwedîyê qanûna esasiyek çewa, perwerdekirina netewî wê çewa be, munâqše kir".

Realîstiya H. Mizgîn

Kamiran Bêkes

Di hejmara Armancê ya 134'an de, gotarek heval Hesen Mizgîn bi navê "Kurd û realîstbûn" geleki bala min kişand. Çi heyf û mixabin ku vê gotarê di nav rûpêlên Armancê de cih girtiye. Gava min ev gotara xwend, weku hezar şemaq û sile li min ketin. Lî, min av li ber dilê xwe reşand, min got qey min ji gotarê fêm nekirîye. Min ew ji nû ve xwend. Lî.. ez nizanim çi bibêjim. Min hewce dît ku ez ber-sivekê ji H. Mizgîn û ji ser-nivîkarê Armancê re binivîsim.

H. Mizgîn di nivîsa xwe de eşkere nişan dide, ku daxwaza Kurdistanâ serbixwe "xeyal" e û ew sînorênu ku Kurdistan kirine çar perçê ji wek rastiyekê dîrokî dibine. Ji şerê çekdarî re cih nehiştiye û yekîtiya hêz û rîxistînê Kurdistanî re ji dibêje başe, lê ne pêwîst e!!!

Welatê me Kurdistan di navbera çar dewletan de, Tirkîye, İran, Iraq û Sûriyê de hatiye perçekirin. Ev dabeşkirin bûye sedemê gelek serîhildanan. Loma gelê Kurdistanî ji bo bidestxistina mafê çarenûsi, serxwebûn û azadiya xwe, bi serbilindî li xwe xwedî derke-tye. Mafê çarenûsi mafekî pîroz e. Ew di hemû lihevhatin û pey-manen navneteweyî de hatiye qebûlkirin ku ew mafê hemû ge-lén cîhanê ye, (çi bi çûk, çi me-zin, çi reş, çi sipî...). Neteweyen Yekbûyî ji vê yekê nas dikin.

Mafê çarenûsi tê wê maneyê ku her milletek maf heye ku qede-ra xwe bi destê xwe tayin bike.. Hebûna xwe ya siyasi, ekonomî û kulturî bi awakî azad biparêze. Ango, mafê hemû gelên cîhanê heye ku di çarçeveke siyasi de, di nav dewleteke milî de hebûna xwe, kultur û ekonomiya xwe bi-parêze û bi pêş ve bibe. De içar şel, çawa û statusa wê dewletê, gel bi xwe destnişan dike. Bi bi-

ryara azad a gel, ew dewlet dikare serbixwe, federal an konfederal be. Helbet cihê otonomiyê di ferhen-ga çarenûsiya gelan de nîne.

Mafê çarenûsiye ji bo gelê Kurd dikare bi du awayan bête bi-karanîn:

1- Wek mafê gelê Kurdistan bi tevahî, ji bo damezirandina dewletteke Kurdistanâ serbixwe û yekîrîfî. Ü ew bi xwe ji xeyal nîne.

2- Mafê çarenûsi ji bo gelê Kurd li her perçakî. Yanî li her beşekî Kurdistanâ, gelê Kurd maf heye ku qedera xwe bi destê xwe tayin bike, dewletteke millî ya serbixwe, federal an jî konfederal damezirîne. Ev daxwaz di nav teve-gera rizgarîxwaz a millî ya Kurdi-stanî de wek daxwazeke demokrat hatiye qebûlkirin. (Hukûmeta Kurdistanâ Federal, piraniya partîyen bakurê Kurdistanâ.. hwd).

Baş xuya ye, heyâ ku doza gelê Kurdistanâ neyê çareserkirin navça Rojhilata Navîn astî û ewlehiyê nabîne. Ji bo bi serketi-na vê doza pîroz, helbet xebata hêzên şoreşger, welatparêz û pêş-verû yên Kurd bi hev re, mercekî bingehîn e. Wek H. Mizgîn dibêje ne xeyal e. Eniya Kurdistanâ li başûr mînakeke hêja ye.

Di merhela bidestxistina mafê çarenûsi û doza netewî de, gelek tiştîn ku H. Mizgîn wan xeyal dibîne, qewimîne. Ez li vir dixwazim tenê hinekan bînim bîra hevalê xwe yê "réalist": Yekîtiya İtalya û Alemaniya. Hilweşîna İmperatoriya Rûsiya û a Osmanî. Ji nû ve yekbûna Poloniya. Ji-hevketina SSSR, Yugoslaviya û Çekoslovakia. Ma gelo vana hemû ne guherînên sînoran in?! Ma ji bo çi ji xelkê re rastî ye, ji me re "xeyal" e?!" Realîstbûna" xeyali ew e ku em vê rastiyê nebînin, nas nekin û nepejîrinin.

Li Hambûrgê Newroz

Li Ewrûpâye pîrozkirina Newrozan zû dest pê dike. Di 27'ê Sibatê de Li Almanyayê li bajarê Hamburgê Newroza îsal ji aliyê HEVKAR ve hate pîrozkirin. Di şahiya Newrozê de nêzî 2000 kes besdar bû.

Şev ji aliyê Dr. Zekî Budak ve hate vekirin. Dr. Z. Budak di axaftina xwe de li ser zulm û tada dijmin sekînî û wiha got: "Rojîn gelê me yên şahîye ge-lek kêm in. Newroz ji jî wan roja yek e. Newroz li gelê Kurd û Kurdistanâ pîroz be. Bi hemû nexweşiyê xwe ve ez mîzgîniya du tişte nuh didim we. Yek îlankirina Dewleta Federe ya Kurd e, ya din jî avabûna YEKBÜN'ê ye..."

Piştî axaftina Dr. Zekî, ji heyeta Dewleta Federe Ewad Namiq Macid li ser rewşa Kurdistanâ Başûr axaftinek kir: "Ez hemû parlamentoye cîhanê û cihetên demokratik dawetî Kurdistanâ Federe ya demokratik dikim, da ku ew bibînin li gel hemû kîmasîyan, me civatek demokratik ava kiriye... Ji

bona ji nû ve avakirina Kurdistanâ me muhtaciye pir mezin bi aîkariyê heye. Ji ber ku bi du aliya ambargo li ser gelê me heye...

Di şevê de li ser navê YEKBÜN Réxistina Ewrûpa ji B. Stêr axaftinek kir. B. Stêr di axaftina xwe de weha got; "Avabûna YEKBÜN'ê di diroka sosyalistên Kurdistanâ Bakur de destpêkeke hêja ye... Musteqbela wê heye, bi hêvi ye. Lî karê me neqediye... Em careke din gazî dikin sosyalist, şoreşger û welatparêzên Kurdistanâ, werin em li hev rûnên, li me dereng e. Em ji hev ci dixwazin? Ji me ci tê xwestin?!

Di şevê de hozanê mezin Şivan Perwer, Ciwan Haco, Baran, Diyar, Ejder. Hozanê Laz Fuat-Saqa beşdarbûn û bi den-gê xwe yê xweş şev geş kirin.

Her weha Partiya Sosyal Demokrat, Kesk û gelek parti, rîxistîn û dezgâyîn Alman û Kurd ji şevê re mesaj şandin..

Bavê Azad / Hamburg

BEROS



Mahmûd Lewendî

PAŞGOTİNÎ

An ji bi gotineke din "dedîqodî".

Di heşê me mîran de carê bi cih bûye û zû zû ji dernakeve: "jin her paşgotinîya dikin, dedîqodicî ne, her behsa hev dikin, li paş hev gotinîya dikin, nikarin hevûdu bikişin, ji hev diqeherin, û niznim ci û ci û ci..." Lî wek mîrekî hema weha em ji xwe re suhbeteke xwe wek şerîta filmekê bînin ber çavê xwe. Gelo em di wan suhbetan de qala ci dikin? Ème ji her eynî tiştin. Nivîkarêne me yên mîr têne ba hev dedîqodîya nivîskarekî din dikin. Serokên me yên mîr dedîqodîya serok an giregirekî partîyeke din dikin. Axayêne yên mîr têne ba hev paşgotinîya axayekî din dikin...

Ka bisokinî ez ji we re qala serpêha-tiyeke xwe bikim. Çend roj berê ez û du hevalên nivîskar em ji xwe re li qahwê rûniştibûn. Me suhbet dikir. Bê guman ez dibêjim suhbet, lê ji subetê wêdetir me paşgotinîya nivîskarekî din dikin, me tiştîn nemayî digot. Demek derbas nebû ew nivîskar hat ba me. Silav da û rûnişt. Wekî ku qet tiştek nebûbe me hal û ehwalê hev pîrsî. Bi wî re ji suhbeta me geş bû, welê geş bû ku içar me bi hev re paşgotinîya nivîskarekî din kir. İcar ci tesaduf,

nivîkarê ku me dedîqodîya wî dikir çîma di ber qehwê re derbas nebû, wele hema ji me yek rabû û ban kirê. Camêr hat, wî ji silav da û rûnişt, me û wî ji me hal û ehwalê



hev pîrsî. Suhbeta me dîsa geş bû û suhbetê berê xwe da ser riya dedîqodîye, me dîsa bi hev re paşgotinîya nivîskarekî din kir. Saet bû çarê êvarê, ez mecbûr bûm rabim, çimkî min û jinikê me yê li çarşîyê hevûdu bidîta. Ez rabûm, min xatir ji wan xwest, hemûya bi rûkenî û dilxweşî xudahafizî li min kirin.

Lî ez ji we re sond bixwim, piştî ku ez rabûm wan dedîqodîya xwe li ser min domandine.

CEND SALÎ YE

Hakim ji jinika şahid di-pirse:

-Tu çend salî yi?

Jinik:

-28 sal û çend meh!

Hakim:

-Yanê çawa çend meh?

Jinik:

-Yanê ez 28 sal û 115 mehî me!



Em her şîyar in

Li gundekî Nisêbînê xort propaganda dikin û ji gundişyan re dibêjin "ji bo xelasîya welat, divê ku hûn şîyar bin".

Gundiyeck:

-Birazê, ji ber dengê van top û tifangan em qet raneketine ku em ne şîyar bin, em her şîyar in!

EZ MEYMÛNÊ NAXWAZIM

Mirovîkî ji xwe re jineke dewlemed anîbû. Rojekê ji jîna xwe pîrsî:

-Erê, te li mala bavê xwe wexta xwe çawa derbas dikir?

Jinik:


-Bi meymûnê xwe.

Mîrik:

-Yanê tu dixwazî ez ji ji te re meymûnêkî bikirim?

Jinik:

-Na welleh, hema bila tu her hebî û li ba min bi, ez meymûnê naxwazim!



ne karê aqila ye lê rast e

Amadekar: Hesen Mizgîn

◆ Li bakûr û başûrê dinê du qutbêne ji bûzê hene. Li van deran çiyayêne ji qesayê car carna bi ava behrê ve diçin. Van qesayêne bi heybet û mezin gelek caran keştiyên kar, seyehatê yan ji tankê-ran di nagine. Amerikî van çiyayêne ji qesayê ji satelita taqib dikin û her serê saetê rapor disînîn keştiyan û li gor van rapor an keşti seyra xwe tayin dikin.

Çiyayêne ji qesayê di rojekê de 40 km. rî distînîn. Giraniya çiyaki ji qesayê dighije heya 250.000 tonê.

◆ Dema mirov telefonê Tokyoyê dike û dixwaze ji xwe re odekê vegetine, resepsiyonîstê otêlê te bi reheti fêm

dike. Dataya(kompîtora) resepsiyonîst gotinê te raste rast vedigerine Japonî.

◆ Li gor lêkolinerên Ingilizi kesen destrast ji kesen destçep direjtir dijin. Li gor encama lêkolînê dema yekî/ê destrast dibe 75 salî yê destçep di 66 saliya xwe diçe rehmetê. Lî sebeba vê yekê çiye hêj nayê zanîn.

◆ Aliyê rastê yê laşê mirovî ji aî çepê nîv kilo girantir e. Hestî û adele ên aliyê rastê pîrr caran ji yê çepê bi qewettir in.

◆ Planeta Jipiter bi çapa xwe ji Dinê 10 car mezintir e û bi 13 hîvén xwe dişibe sistema rojê. Li gor alimên Rûs dê Jipiter ji piştî 3 milyon sal ciyê Rojê bigre. Jupiter ji gazên hidrojen û helju-mê pêk tê.

◆ Li dinê kufkarika (Karok) heri bi emirtir li Amerika Navîn li ser kevirî hate ditin. Kufkarik 40 milyon salî ye.